



## Sal, 1997: Li aliyekî çewsandin, li aliyekî têkoşîn

Hevpeyvîn ligel Hozan Baran:

Heke em masî bin,  
folklorê kurdî behr e

R. 8-9

Zülküf Kışanak:

Şoreşgero bêmerde;  
Selahattin Üçkardeş

R. 6


D. N. Mackenzi:

Melayê Cizîrî û  
Feqî Teyran

R. 4-5



**Azadiya WELAT**



SAMI TAN

Her pergala û rejîm dixwaze bi riya perwerdehiyê kadroyên xwe bigihîne, bîrdoza xwe bi riya wan li nav civakê belav bike da ku berjewendiyên xwe wekî yên giştî nîşan bide.

**Perwerdehî û amadehiya piştî şoreşê**

**A**madekirina vê hejmara me, rastî sala nû hat. Ji bo pîroznameyê gelek mesajên sersalê ji me re hatine, ji bo ku ew mesaj belav bibin, me di vê hejmarê de li cihê gotara rûpelê didu, hin ji wan weşandin. Em ji hemû kes û sazîyên ku ji me re mesajên sersalê şandine re spasîyên xwe pêşkêş dikin û sersala wan ji dil û can pîroz dikin. Li aliyê din jî ve hêjmarê pê ve, emê rûpela xwe ya 16'an ji bo manşetên hefteyê yê rojnameya Ûlkede Gündem terxan bikin. Heta ku qedexeya li ser wê bidome, rûpela me yan 16'an jî wê bi vî awayî derkeve. Pêdivî bi helwestgirtinê heye, ew helwest her çiqas, sembolîk be jî.

Di vê nivîsê de me divê em hinekî li ser perwerdehiya neteweyî û wateya sazîyên neteweyî rawestin. Ji ber ku pêdiviya me, bi vî yekê heye. Nebûna perwerdehiya bi zimanê kurdî rê li ber gelek arîşe û çewtîyan vedike. Gelê kurd li Bakur di warê xwendin û nivîsandinê de, hê di asta, şagirtê dibistana seretayî de ne. Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe rê li

ber serdema ronahîbûna civaka kurd vekir. Lê dagirker jî heta ji wan tê dixwazin me di rewşa berê de bihêlin, bi vî mebestê bi her awayî bi ser me de tîn, nahêlin ku em sazîyên xwe yê neteweyî pêk bînin. Em dest bi perwerdehiya bi zar û zimanê xwe bikin û gelê xwe perwerde bikin. Doz û daxwaza wan ev e ku kurd tim wekî berê nezan û nexwende bimînin. Heke bixwînin jî bi zimanê wan û li gorî bîrdoza wan bîn hevotin da ku bersivê bidin daxwazên wan.

Her pergala û rejîm dixwaze bi riya perwerdehiyê kadroyên xwe bigihîne, bîrdoza xwe bi riya wan li nav civakê belav bike da ku berjewendiyên xwe wekî berjewendiyên giştî nîşan bide.

Niha em wekî civak bi rê û rêçikên alternatîf, bi riya sazîyên nefermî ve yekê dikin. Lê dijmin xetereya li ber xwe dibîne, lewre jî nahêle ku sazîyên neteweyî derkevin holê. Yê ku derketine jî tengav dike.

Ji ber vê yekê divê em girîngiya sazîyên xwe yê neteweyî baş bizanibin û neyên xapa dijmin. Rojnameyên me çî bi

tirkî, çî jî bi kurdî bingeha rojnamegerî û perwerdehiya neteweyî datînin. Sibe roj kadroyên ku ji nava van rojnameyan û televîzyona kurdî derkevin wê karê ragihandina neteweyî bi rê ve bibin. Dîsa ji nava NÇM'ê rêveberên şanoya neteweyî, muzîka neteweyî û hunerên bedew dê derkevin. Înstîtuyên me yê ku em îro zêde guhê xwe nadinê, alîkariyê di karê wan de nakin, wê sibe bibin zanîngehên me. Divê em bi vî çavî li van sazîyan binihêrin.

Divê bi her awayî em xwe û sazîyên xwe ji bo vî karî amade bikin. Xwe ji bo wê roja "giran" amade bikin. Belkî îro karê ku em dikin bi me pir giran tê, lê karê me yê piştî serkeftinê, heke em xwe ji îro de jê re amade nekin, wê ji îro ne siviktir be.

Birek şoreş hene ku çûne serî, desthilatî ketiye destê kesên şoreşger, lê ji ber ku ne xwendiyê tu plan û projeyan bûne, xitimîne û piştî demekê têk çûne. Divê em tu car hilweşîna sistema sovyetê ji bîr nekin. Ji vê azmûna têkçûyî dersê hilgirin.

**Pîroznameyên sersalê ji bo Azadiya Welat**

**Ferhengok**

**alozî:** tevlihevi  
**alav:** amûr, hacet  
**akincih:** xwecih  
**arîşe:** pirsgerêk  
**asêgeh:** cihê asê  
**azmûn:** îmtihan (sînav)  
**bageran:** bablîsok  
**berdar:** berhemdar  
**berg:** qapax  
**bertek:** reaksiyon  
**beyaniya sibê:** serê sibê  
**cinavk:** zamîr  
**çarîn:** çar rêz (dörtlük)  
**dabaş:** mijar, mewzû  
**doman:** pêvajoyê  
**feza:** uzay  
**gelemperî:** giştî  
**helwest:** tewr  
**hevok:** cumle  
**hêvotin:** perwerdekirin  
**hoker:** edat  
**kêlî:** dema kurt  
**kend û kosp:** asteng  
**lebat:** livîn  
**lêhûrbûn:** giranî dayîn  
**lêker:** fîl  
**mêjû:** dîrok  
**misk û ember:** bêhneke taybet a xweş  
**nemaze:** nexasim  
**payebilind:** payeberz  
**pejirandin:** qebûlkirin  
**perav:** qeraxa avê  
**peyv:** bêje  
**peywendî:** têkîf

**pêvajoyê:** proses  
**pêşbînî:** texmîn  
**pêşdarazî:** pêşîn hîkum  
**piştrastî:** amintî, bawerî  
**qedimandin:** bi ber ve çûyîn  
**qesade:** şeweyekî helbestê  
**qewimîn:** rûdan  
**qîzap:** dotmam  
**qor bi qor:** rêz bi rêz  
**qozexer:** keskesor  
**quntar:** li pal  
**qurçek:** qurtek  
**qût:** erzaq  
**resen:** orjînal  
**rêbaz:** metod  
**rêz û rêçik:** qayide  
**selmandin:** peyitandin  
**siqakirin:** tûjîkirin  
**sincirîn:** sorbûn  
**şîyan:** karîn  
**şûrik:** hesinê piştê derî  
**tayîn:** çilwîlîn  
**tebat:** rawestîn  
**tevger:** bizav  
**têvel:** cur bi cur  
**tisî:** nanê bê qatir  
**tika:** rica  
**tirgêk:** tirêja rojê  
**veqetandek:** qertafa îzafeyê  
**xetere:** talûke  
**xim:** him, bingeş  
**xor:** hetav

**XEBATKARÊN AZADIYA WELAT EN HÊJA**

*DI sala 1997'an de gelê kurd, ber bi azadiyê ve gavên dîrokî evêtin. Sala 1998'an jî li şer bingeha 97'an ji niha ve tê amadekirin.*

*Bi baweriya amadekirina azadiyê em sala 1998'an li we xebatkarên Azadiya Welat pîroz dikin.*

GIRTİYÊN PKK'YÎ/ BARTIN

**JÎ AZADIYA WELAT RE**

*EM di xebatên we yê pêşerojê de serkeftin û serfiraziyê dixwazin.*

*Em vê sersala we ya nû li tevahiya xebatkarên Azadiya Welat pîroz dikin.*

NESÎH ALTUNER/ BARTIN

**MERHEBA...**

*ME saleke bi êş, bi zehmetî, bi hêztir; lê di heman pîvanê de bi serkeftin û serfiraziyên tijî û qewimînên dîrokî li paş xwe hişt.*

*Di destpêkirina saleke nû de, sala nû pêşî ji gelê me re; ji hemû gelên bindest re aşî, azadî û biratiyê bîne. Em hevî dikin ku ked, xebat û janên 1997'an, di sala 1998'an de ji gelê me re bibe gavake serkeftî û riya azadî û serfiraziyê ji gelê me re veke.*

*Bi van dilên xwe em sala we pîroz dikin, di xebat û jiyana we ya weşanê de tenduristî, serfirazî û serkeftinê dixwazim.*

*Bi rêzên xwe...*

MURAT ÇETINKAYA/  
GIRTİGEHA ERZİROM

**ROJBAŞ HEVALNO!**

*EZ silavên xwe ji we re bi rê dikim. Di kar û xebatên we de serkeftin û serfiraziyê dixwazim. Sala 1998'an bila bibe sala yekîtiya neteweyî û sala xwendin û nivîsandina bi kurdî ji bo gelê kurd.*

*Yekîti û xwendin ji bo gelê kurd wekî nan û avê pêwîst e. Ez ji Kongreya Netewî re jî serkeftin dixwazim, zarokên me Egît û Mahir jî ji bo xebatkarên Azadiya Welat û mamoste Amed Tigrîs silavên xwe bi rê dikin.*

*Bimînin di xweşiyê de.*  
ŞIWAN YÜRÜK/ WAN

**BIRÊZ XEBATKARÊN AZADIYA WELAT**

*DI têkoşîna bînpêkirina îxanet û hevkarîyê de, bi rastiya gihîştina Konferansa Neteweyî, bi mîzgîniya têkoşîndayîna Kongreya Neteweyî, di ketina sala nû de, di maratona fetihkirina Mezopotamyayê jî aliyê gelê xwe ve, bi hêviya ku sala 1998'an bibe sala desthilatdarî û serkeftinê, bi germahiya têkoşîna xwe me salek xilas kir û dîsa em mora xwe li sala nû dixin.*

*Bi coşên van hêviyên xwe, em sala we ya nû pîroz dikin û silav û rêzên xwe yê şoreşgerî ji we redîşînin.*

*Ber bi salên azad ve...*

Li ser navê girtiyên PKK'YÎ yê GIRTİGEHA MÊRDÎNÊ/  
SEYDOŞ DANIŞ-MECİT YALIM

**MERHEBA...**

*EM sal we ya nû ji dil û can pîroz dikin. Bi germahiya van rojan, em we bi rêz û hezkirinê hembêz dikin.*

HİKMET YASAY GIRTİGEHA  
SARUHANLIYÊ/ MANİSA

**MERHEBA...**

*SALA we ya nû, ji dil û can pîroz dikim. Sala nû ji bo gelê me bibe sala hêviyê û wekhevîyê. Ji we re jiyanekê bi rûmet û serkeftinê dixwazim.*

F. ZÊREVAN/ AMED



# Sal, 1997: Li aliyekî çewsandin, li aliyekî têkoşîn

Beriya her tiştî guherîneke bingehîn di politikayên dewletê û rewşa siyasî de pêk nehat. Paqijkirina hemû qirêjiyên sala 1997'an ma ji sala 1998'an re. Lê ji bo me tiştên ku em hêvîdar dikin jî pêk hatin; 'Ji bo ronîkirina domdar deqîqeyek tarîfî, çalakiya gundiyan Bergamayê, berxwedana karkerên ku piştî arizîkirinê bê kar mabûn, çalakiyên li zanîngehan û gurbûna doza aştiyê.

Di sala 1997'an de gelek tiştên erênî û li dijî vî yekê gelek bûyerên neyînî jî pêk hatin. Di sala 1997'an de dîsa ji bo çareseriyê kêşeya kurdî tu gav nehatin avêtin. Her wiha di sala navborî de mirov hatin kuştin, îşkenekirin, mafên wan ên bingehîn hatin bîpêkirin, gund hatin şewitandin, karker bêkar man, xizani bû, êrişên faşîstan li her alî, bi taybetî jî li zanîngehan gur bûn. Politikaya nîjadperest a dewleta tirk bi her awayî xwe bêhtir êşkere kir. Dewleta tirk li ser gelên ku li Tirkîye û bakurê Kurdistanê politikayên asimilasyonê zêdetir kirin.

Her wekî me berê jî dabû xuyakirin, gelek bûyerên erênî jî pêk hatin. Gelê kurd jî têkoşîna xwe tawîz neda; têkoşîna gerîla li herêma Bahra Reş û Bahra Spî belav kir. Doza aştiyê bi hatina aştiwazên ewrûpî û çalakiya trêna Aştiyê deng veda. Dîsa dewleta tirk di gelek dozan de li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê hate mehkûmkirin. Deriyê Yekîtiya Ewrûpayê li ber dewleta tirk hate girtin. Li Civîna Rêxistina Îslamî ya Navneteweyî jî rexneyên tund li dewleta tirk hatin girtin û mesaja Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate xwendin, ji ber vî yekê Serokomarê Tirkîyeyê Süleyman Demirel zû jî zirveyê veqetîya. Berteka li hemberî dewleta tirk di qada neteweyî de de her roj zêdetir dibe, hestên biratî û hevalbendiyê di navbera gelê kurd û tirk de xurtir dibin.

Me li ser sala çuyî û sala nû nixandî û dîtînen sazîyên demokratîk girtin. Cîgirê Serokê Giştî Hamid Geylanî, Serokê ÎHD'ê Akın Birdal û Sekreterê Giştî yê Baroya Amedê Sezgin Tanrikulu û aborîzan Arslan Başer Kafaoglu pirsên me bersivandin. Sazîyên mîna MED-TV, Înstîtuya Stokholmê û PKDW'ê bersivên xwe negihandin destê me.

**Cîgirê Serokê HADEP'ê Hamid Geylanî sala çuyî wiha nixand:** "Beriya her tiştî guherîneke bingehîn di politikayên dewletê û rewşa siyasî de pêk nehat. Paqijkirina hemû qirêjiyên sala 1997'an ma ji sala 1998'an re. Aboriyeke enflasyonist, nebaşbûna têkiliyên bi dewletên cîran û cîhanê re, li hev nekirina dewletê bi gelê xwe re dom kir û keda kedkar û karkeran li şerê qirêjî hat xercîkirin. Xesarên mezin ji ber bîpêkirinên mafên mirovan di jiyana civakî de pêk hatin. Qelsiya rejîmê û rizîbûna wê di warê tenduristiyê de jî nîşan dide."

Her wiha Geylanî diyar dike ku heger


di warê siyasî, civakî, aborî û çandî de guherînen bingehîn û li gorî daxwazên demê pêk neyên, parastina ewletiya canê mirovan jî pêkan nabe. Geylanî di dewama daxuyaniya xwe de dibêje: "Ev 14 sal in ku parçeyekî vî welatî tê bombekirin. Şewitandina daristanan, windakirina xwezayê, koçberkirina mirovan, politikaya jehrîkirina avê bîpêkirina mafên bingehîn ên mirovî ne."

**Serokê Giştî yê ÎHD'ê Akın Birdal:** Serokê Giştî yê ÎHD'ê Akın Birdal di nixandina xwe ya der barê sala 1997'an de li ser awayê rêveberiyê û mafên mirovan rawestîya. Akın Birdal di daxuyaniya xwe de diyar dike ku sala 1997'an saleke zor diwar bûye. Di vî salê de Tirkîye ji heqê bîpêkirina mafên mirovan derneketiye. Birdal diyar dike ku her çiqas Tirkîyeyê xwestibe ku xwe li gorî normên



Akın Birdal

navneteweyî xwe saz bike û xwe tevî nav gelê Ewrûpayê bike jî, ji ber helwesta xwe ya li hemberî mafên mirovan neyînî, li derveyî welatên demokratîk maye. Birdal daqixîyîne ku, beriya her tiştî kêşeya kurd bi awayekî demokratîk nehatiye çareserîkirin. Her wiha pirsîrêkên li ber azadiya derbirina ramanan bi her awayî dom kirine. Di girtîgehan de çareserîyeke ku bi mafên mirovan ve girêdahiye pêk nehatiye. Ji aliyê din ve Birdal diyar dike ku krîzên ku ji aliyê aborî ve ketin nava Tirkîyeyê tuntir bûne. Bandora awahiyên finansî yê navneteweyî li ser Tirkîye yê hêhtir bûye. Piştî re jî wiha dom kir: "Lê ji bo me tiştên ku em hêvîdar dikin jî pêk hatin. 'Ji bo ronîkirina domdar deqîqeyek tarîfî, çalakiya gundiyan Bergamayê, berxwedana karkerên ku piştî arizîkirinê



Hamit Geylanî

bê kar mabûn, çalakiyên li zanîngehan û ya herî girîng ku aşti û kêşeya kurd kete rojê gelek partiyên siyasî, komele û rêxistinên civakî yê sivil jî, aliyên erênî yê sala 1997'an in.

**Parêzer Sezgin Tanrikulu,** di sala 1997'an Xelata Parastina Mafên Mirovan ya John Kennedy stend. Li ser sala 1997'an parêzer Tanrikulu jî dîtî û ramanên xwe daxuyandî.

Li gorî parêzer Sezgin Tanrikulu sala 1997'an bi awayekî tund û bi îhlalên mafên mirovan û bêhiqûqiyê derbas bûye: "Li Tirkîyeyê dîsa ji bo çareseriyê kêşeya kurd tu gav nehatin avêtin. Tirkîye sîvdarê mirovan e. Parêzer Sezgin Tanrikulu dide zanî ku di sala 1997'an de tiştên erênî jî pêk hatine.

Hikûmetên ku hatine ser kar jî ber politikayên dewletê kêşeya kurdî nedîfîne. Ev yek jî bûye sedema neketina nav civaka Ewrûpayê. Ji ber vî yekê Tirkîyê firsendeke zehf mezin ji destê xwe revandîye". Tanrikulu jî bo sala 1998'an jî wiha dibêje: "Di sala 1998'an de divê kêşeya kurd bibe pirsîrêka bingehîn. Guherîna vî salê jî vî yekê kêşeya kurd ve girêdayî be. Tanrikulu dixwaze ku sala 1998'an bibe sala aştiyê.

**Aborîzan Arslan Başer Kafaoglu,** der barê 97'an ev nixandî kir: "Welatekî ku împeryalist e, demokrasîyê tu carî naxwaze. Ev yek jî di sala 97'an de bi awayekî zelal diyar bû." Kafaoglu jî aliyê aborî ve jî hin ramanên xwe wiha diyar dike: "Dibêjin dahatûya giştî ya neteweyî zêde dibe, lê tiştêkî bi wî rengî nîn e. Tirkîye jî aliyê xwezayê ve roj bi roj têk diçe. Ji ber van yekan karê xwedîkirina ajalan û çandîniyê têk diçe. Vê yekê bandor li ser sanayîyê jî kir. Êdî hew mirov pereyên xwe li sanayîyê radizînin." Nivîskar Arslan Başer Kafaoglu vî yekê bi erozyona demokrasîyê ve girê dide." Kafaoglu diyar dike ku rewşa kurdan bêhtir dilê yekî diêşîne. İnsan tînen kuştin, xanî tînen şewitandin. Ji bo vî rewşê xelkê Anatoliyê jî bo halê xwe şikir dikin. Sala 1998'an jî wê tiştê neguhere, dewleteke kapîtalîst demokrasîyê nas nake, ev tişt dûrî wan e, di nav kapîtalîzmê de, mafên mirovên nîn e."

AZAD ALTUN

## Kurtenûçe

Mehmet Çimen ji bo protestokirina kiryarên dewletê ya li dijî gelê kurd û bi taybetî li dijî girtiyên Girtîgeha Erzîromê xwe şewitand. Mehmet Çimen ji Ercîşa Wanê ye û jiyana xwe bi karkeriyê didomand. Li Wanê jî layê hêzên dewletê ve 7 caran hate girtin, di dawiyê de nema debar dike û koçberî bajarê İzmirê dibe. Li vî derê jî du caran tê girtin. Mehmet Çimen beriya ku xwe bişewitîne nameyekê dinivîse û li hemberî kiryarên hovane a li ser girtiyên Erzîromê radiweste û raya giştî dawetî pêjinkariyê dike.

**Serokê rûhaniya alema Îsewî Pa-Spa Jean Paul,** di mesaja xwe ya sala nû de, ji bo gelên bindest bangê serxwebûn û azadiyê kir. Di serî de gelê kurd û çermesor wekî mînak dan nîşan û got: "Ev gel û gelek gelên din ji bo azadiyê şer dikin û berdêlên mezin didin. Divê desthilatdarên dinyayê qîrîna van gelan bibihîzin û alîkariyê ji wan re bikin." Di salên borî de heyata Hereketa Îslamî û endamên Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welêt (PKDW) hevdi-tînek çekiribû û bi vî helwesta xwe tiştêkî ku gelek kesan jê hêvî nedikir, kir.

**Kend û kospên dewletê** li dijî çapemeniya dijber di van rojên dawîn de bi awayekî domdar berdeham e. Piştî rojnameya Ûlkede Gündem û Emekê ku nahêlin, ew bikevin Kurdistanê, niha jî hejmarê 58'an a Hêviyê bi biryara DGM'ya şesemîn a Stenbolê hate berhevîkirin. Di vî hejmarê de nivîsa Çınar Yılmaz a bi navê "Haddini bilmez biri", nivîsa Mehmet Bayrak a bi navê "Dışa bakış", nivîsa Çetin Taşçı ya bi navê "Özgürlük yolunda bi adım daha" di berhevîkirinê de wekî hincet tînen nîşandayîn.

**Damezrîner û Sekreterê Giştî yê TKEP'ê Teslim Töre** ji ber dozeke ku der heqê wî de hate vekirin, li DGM'ya çaremîn a Ştenbolê hate darizandin. Derheqê nivîsa wî ya bi navê "Amaç ve araçta uyum" ku di rojnameya Newroz de hatibû weşandin, bi hinceta 'propagandaya cudaxwazî hatiye kirin' doz hatibû vekirin û dûv re bereat kiribû. Lê dadgeha bilind ev biryar nepeytand û doz jî nû ve hate vekirin. Tiştê balkêş her çiqas ev doz li dervê di hate darizandin jî, bi awayekî kelepeçekî ew anînen dadgehê. Doz jî ber hin kêmasiyên dosyayê hate taloqîkirin.



# Melayê Cizîrî û Feqî Teyran di çî demê de jiyane?



**P**ir kêm tişt der barê helbestvanên kevnare yên kurd de tê zanîn. Kop-yayên berhemên wan pir kêm in û bi piranî li ber destê hin kesan dirizin. Çend agahiyên ku li ser jînenîgariya wan ji hêla kesên cur bi cur ve hatine nivîsîn jî li hev nakin. Çend agahiyên ku derdikevin pêş, ji ber vê yekê gelekî hêja ne. Ev agahî jî diyariyêke biçûk a bîra kesekî ku xwediyê bandoreke mezin e li ser kurdan. Wî kesî ke deke mezin daye xebata li ser dîrok û çanda kurdî.

## Li gorî Mahmûd Efendiyê Bazîdî û A. Jaba ew di demên cuda de jiyanê

Çavkaniya yekemîn a li ser helbestvanên kurd ên pêşîn, nivîsa ku ji hêla Mahmûd Efendiyê Bazîdî ve ji bo A. Jaba hatiye nivîsîn û berî sedsalekê di bin navê "Recueil de notice et recits kurdes" de hatiye weşandin e. Di nava wê xebatê de kesên di rêza duyemîn û sêyemîn de cih digirin, yanê Melayê Cizîrî û Feqî Teyran, nemaze jî bi mêjûya ku tê de jiyanê, niha dibin mijara lêkolîna me. Kesê yekemîn li gorî ku Bazîdî nivîsiye "Ji Cizîra Botan e. Navê wî Şêx Ehmed e. Ew li Cizîrê di sala 540'ê hicrî (1145-46 m.) de hatiye cihanê. Şêx Ehmed di sala 556'an (1161) de çûye ser dilovaniya xwe." Yê duyemîn, "Navê wî Muhamed e, ji gundê Miksê ye û di sala 705 h. (1302-3 m.) de hatiye ser rûyê cihanê.

Di helbestan de navê wî "Mîm û hê" ye, 75 salan jiyanê û di sala 777 h. (1375 m.) de çûye ser dilovaniya xwe."

Çewtiya ku hê di destpêkê de balê dikişîne ev e: Li gorî vê agahiyê Melayê Cizîrî 16 salan jiyanê. Jaba jî xwestiyê ser vê çewtiyê bigire û lewre jî di wergerandinan de peyva "peyda bûye" destkarî kiriye û ew wekî "di sala 540'î de li Cizîrê hatiye nasîn" wergerandiye.

Di destpêka vê sedsalê de dema M. Hartmann destnivîsa diwana Cizîrî çap kir, wî jî ew werger pejiwand, bi vê mêjûyê piştrastiya xwe diyar kir û ji ber vê egerê reseniya helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê "Tekrî-bend" anî rojevê, ji ber ku tê de xazela yekemîn a Hafîz (791/1389) derbas dibe. Di berhema xwe ya bi navê "Mêjûy Edebî Kurdî" de Aladîn Secadî vê mijarê jî nîqaşê re vedike. Ew pêşî nîşan dide ku di diwana Cizîrî de li cihêkî din jî serî li Hafîz hatiye dayîn:

*Ger lu'lu manzûr ji namzê tu dixwazi  
Dar şîrê malê bîn, ta bi Şîraz çî hacet*

Paşê hê jî pê de çûye, navê Cizîrî û Elî Herîriyê ku di xebata Jaba de di rêza yekemîn de cih girtiye, di helbesteke Camî 817-899 h. (1413-1492 m.) ku di dema heca xwe de nivîsiye, daye:

*Pîrmîrdî bidî deam ji Cizîr  
Nîm mîrdî bidî deam ji Herîr*

Secadî li ser bîngeheke ne pir zexim,

bi texmîni mêjûya ku Cizîrî tê de jiyanê, daye. Li gorî wî ev mêjû 811-886'yê hicrî ango 1407-1481'ê mîladî ye. Wî di nav lîsteyêke dirêj de di bin sernavê "Baxî Şarîran de" çêlî Feqî Teyran jî kiriye û ev agahî dane: "Teyran ê Makûyê di navbera salên 1307 û 1375'an de jiyanê."

## Helbesta ku her du helbestvanan avêtiye ber hev nîşana çî ye?

Lê hûrbûneke kûrtir li ser vê mijarê, ji aliye muftiyê Qamişliyê Ahmed b. Mula Muhammed el-Buhtî el-Zîvîngî ve hatiye kirin. Wî diwana Cizîrî bi zîmanê erebî şîrove kiriye. Ew jî qala pêşbîniyên Secadî dîke û dîde zanîn ku Cizîrî di helbesta "Tahrîb-bend" de dabaşa Sa'dî û Camî kiriye. Delîlên ku ew dide, vê ramanê xurtir dîkin, ji ber ku ew mêjûyêke diyar dide.

Di diwana çapa Hartmann de jî, di ya Qamişli de jî helbestek heye, tê de Feqî Teyran û Cizîrî avêtine ber hev.

Ev nivîsa

D.N. MACKENZI

ji pirtûka bi navê Şêx Sen'an a Feqî Teyran hatiye wergerandin.

Ev pirtûka navborî di sala 1986'an de li Stockholmê jî nava weşanên Roja Nû derketiye. Nivîs jî hêla SAMÎ BERBANG ve ji inglîzî hatiye wergerandin.



Di destpêka vê sedsalê de dema M. Hartmann destnivîsa dîwana Cizîrî çap kir, wî jî ev werger pejirand, bi vê mêjûyê piştrastiya xwe diyar kir û ji ber vê egerê reseniya helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê "Tekrî-bend" anî rojevê, ji ber ku tê de xazela yekemîn a Hafiz (791/1389) derbas dibe. Di berhema xwe ya bi navê "Mêjûy Edebî Kurdî" de Aladîn Secadî vê mijarê ji nîqaşê re vedike.

Ew ne helbesteke pir payebilind e, lê çarîna yekemîn têrê dike ku mirov têbigihêje ka ew di şeweya kinayeyê de çiqas girîng e.

**Feqî:**

*Selama min heqî re/ Sedefek tivê têkin  
Îro di Cizîrê / Heqe melê kin  
Ku ji derba tîrê/ Derman heye lê kin.*

**Mela:**

*Selamên milyaketan/ Bê hed û bê  
hisêb in  
Şubhatî avên şetan/ Ji Mele li Mîm û  
Hê bin  
Hilakên ji zehmetan/ Derman ji lam û  
bê bin.*

**Feqî:**

*Şerbeta lam û bêan/ Nadim ez wê bi he-  
yatê  
Me'dena da û rêan/ Dibarînin nebatê  
Îzhar dikin me'ne ye/ Ji husna but û la-  
tê*

Muftî ji van gotin encameke zelal derdixe (ku Hartmann tê demexistiye): Her du helbestvan di heman demê de jiyane. Di ser de jî wî xwe gihandiyê helbestên Feqî Teyran (ku li gorî gotina wî ji Makûyê ye) ku tê de qala Cizîrî tê kirin û ji wan, ev qesîdeya ku wiha dest pê dike pêşkêş kiriye:

*Li Muhammed heft felek ji hucret  
dewr gelek çûne*

*Hezar zel, çil û yek çûne, ev xezel hate  
dîar e*

Ji vir xuya dibe ku wî di sala 1041'a hîcrî ango 1631'ê mîladî de ev helbest nivîsiye û "mamosteyê wî" Cizîrî bi

texmînî di sala 1050 h. (1640 m.) de çûye ser dilovaniya xwe.

### Li gorî Celadet Bedir-Xan Feqî şagirtê Cizîrî ye

Ev yek ji hêla parçeyek ji helbesteke Feqî Teyran ve jî tê selmandin. Di hejmareke kovara Hawarê de bi navê He-rekol Azîzan, Celadet Alî Bedir-Xan nivîseke bi sernavê "Klasîkên me" nivîsandiye, di vê nivîsê de ev tê gotin: "Dibêjin Feqiyê Teyran şagirtê Melayê Cizîrî ye û li ber destê wî gihîştîye. Her wiha Feqî li ser mirina Cizîrî qasîdeyek nivîsiye û di vê helbestê de mêjûya mirina wî jî tê dayîn. Ev qesîde demekê li ber destê min hebû, lê dema min dest bi vê nivîsê kir, min peyda nekir. Dîsa jî baş tê bîra min ku Feqî tê de wiha gotiye:

*Heft eyn û lam ji hev bûn cida  
Şin û girî dîsa tê da*

Heke mirov van gotinan li gorî hesabê ebcedê şîrove bike, bi awayekî zelal dîroka mirina Cizîrî derdikeve holê."

Tevî ku Celadet Bedir-Xan bi xwe ev kar nekiriye jî, M.B. Rûdenko di tîbîniyêke Şêx Senana Feqî Teyran a ku wê bi xwe, dabû çapê de, ev peywîr pêk aniye. Ew vê rêzê bi du awayan şîrove dike.

I- (7x eyn)-(7x lam) = 490-210=280

Şin+gef+re+ye (girî)= 300+20+200+10=530

280+530=810 yanê 1407-8'ê mîladî

II-(7+eyn)-lam=7+70-30=47

47+530= 577 hîcrî, ew jî dike 1181-2'yê mîladî.

Niha diyar dibe ku dîroka di rêzên ku hatine bîra Celadet Bedir-Xan de çiyê: (7x eyn)- lam= 490-30=460

Şin+ye+nun+gef+re+ye= 300+10+50+20+200+10=590

460+590=1050


### Kevnare nîşandana her du helbestvanan hewleke bi qestî ye

Tam jî mêjûya ku Muftî dabû derdikeve pêşberî me. Ji vê yekê jî xuya dibe ku Melayê Cizîrî di navbera salên 980-1050h. (1570-1640 m.)'î de jiyaye. Feqî Teyran jî bi texmînî ji sala 1000'î (1590 m.) heta sala 1070'yî (1660 m.) jiyaye. Tê fêhmkirin ku mêjûyên berê, bi mebesta kevnaretir nîşandayina wan her du helbestvanan hatiye dayîn.

- Çavkanî:** 1. St. Petersburg, 1860, r. 8-11  
2. i.e. Jazîrat b. Umar, mordern Jizre.  
3. Der kurdische Diwan des Schêch Ahmed von Gezîret ibn Omar, genant Mala'î Cizîrî, Berlin, 1904.  
4. Mejû-y Edebî kurdî, Baxda, 1952.  
5. Mixabin min nekarî van rêzan di nava xebatên Camî de peyda bikim.  
6. Al-aqdu l-jawharî, fi sharhî dîwanî l-shayxî l-Jizrî, 2 vols, Qamishlî, 1377/1958.  
7. Hawar hejmar 33, kewçer, Şam, 1941, r.6ff.  
8. Faki Tejran, Shejx San'an, kritîçeskij tkst, pervod, primeçanija i predislovie, M. B. Rudenko, Moscow, 1965, r.4 n.4.

## Nûnerên gel ên rastîn kî ne?

### CELAÛETTÎN YÖYLER



Pêşveçûna Tevgera Rizgariya Neteweyî di qada navneteweyî û neteweyî de, bi sedan gengeşiyên li ser doza gelê kurd bi xwe re tîne meydanê û ew gengeşî dikevine rojeva sazî, rêxistinên demokrat û çapemeniya cihanê û ya saziyên girêdayî rejîmê. Li hêlekê tu dibînî 'tevger' bi çalakiyên pir bi hêz û bi rûmet êrîşê dibe ser îxanetê û çasîkên xwe firotî û nokerên bê şerm û fedî. Li hêla din tu dinhêrî bêrawestî û bihêz, ji her çar perçeyên welêt kesên xwe-nas, şoreşger û welatparêz ji bo komcivîneke neteweyî, tene cem hev û li hev dicivin. Li aliyê dinê te dît yek ji hêleke cihanê, serê xwe bilind dike û dibêje: "Na! ez tevî komcivîna neteweyî nabin", jê dipirsin, "bira çima tu tevî nabî?" dibêje: "Civîna neteweyî ne karê kesan e. Ew karê sazî û partîyan e." Hem jî dibêjin: "Hetanî şer li welat di navbera partîyan de raneweste, ev saziya neteweyî nayê damezirandin." A evên bi van "peyvên mezin" hem dixwazin xwe, ezîtiya

xwe diyar dikin, hem jî piştewaniya îxanetî bi helwestên xwe yê çewt û nelirê derdixîne meydanê û dibin çeper û asteng li pêşiya Tevgera Rizgariya Neteweyî û xwe jî wekî nûnerê gelê kurd didine xuyakirin.

Lê gelê me êdî hişyar û zana ye, her kesî bi dîtînekê objektîfî dibîne û dinirxîne. Hem jî dîsa wekî-vê tevgera wan a neyînî, li Tirkîyê jî, te dît xwe derxistine holê û tevî hînek civînen her wekî ji bo çareserkirina doza kurdî û xwe dane ber zîrtan û gotin, ev civîna, aliyê wê yê erênî ku tê nîqaşkirin doza kurd e, lê aliyê wê yê neyînî jî tevî lenebûna Partiya Demokrasiya Gel e. Yanî her wekî ku ew xwe nûnerê gelê kurd didine diyarkirinê û partiya Demokrasiya Gel jî rexne dikin. Pir mixabin ez, ji wan re, nabêjim ku ew ne kurd in, lê ez wan hişyar dikim ku her kes bi awayê kirînen xwe yê ji gel re, bila bipeyive û xwe di radeya nûnerîtiya gel de nebîne û hinekên din jî, rexne neke. Ez dixwazim nûnerîtiya gel, diyar bikim, ji bo kesên ku wan nas nakin. Nûnerên gel ew in ku li ser zîrtan û latan di nav berf û bageranê de, bê nan û birçî, bi hezaran "gulên" sor û rengeng bi xwîna xwe ya pîroz û paqî rengin kirine. Hem jî yê ku nûnerîtiya me û wan bi hev re dikin jî, ew in ku di qada navneteweyî û welêt de bêwestan û rawestan dikarin bikevine nav saziyên cihanê û pirsgrêka me, bi tevahî, ji wan saziyan re, bêjin; û diyar bikin, ew in. Hem jî

kesên ku di nav çar dîwarên girîgehane de, bi çalakî û berxwedanên bêherîpa û pir bi rûmet xwe didine gorîkirinê, ew in.

Lê em ên ku di malên xwe de, bi malîyên xwe re rûniştî û di nav nivînen gem de ne, divê em çawa bin? Divê em xudanê rêz û rûmetê bin ji bo çalakî û livbaziyên wan leheng û egîtan û bibêjin: "Hûn xort û ciwanên me ne. Hûn çekdar û rûmeta me ne. Hûn keçikên me yê pir hêja û şoreşger in." Ne ku em bibêjin: "Hey lawo navê min 'Hemreş Reşo ye', ez û pîreka xwe û çend heb jî ji axa û began, em jî partî ne û xudanên welat in û pişt xwe didine xwînxwarên gelê kurd, nayêne civînen mezin û rûmeta gelê kurd. Na ev yek gere neyê gotin, divê em bi hev re birêz û birûmet bin ji bo kesên di zîndanên de, yê li ser çîyan, latan û zînan, ji bo ku pirtir em xudan rêz û rûmet bin. Werin em bi hev re çalakiya herî mezin û bi şeref bi hev re binirxînin, çalakiya hevalê ezîz û mezin, çalakiya birayê şoreşger û welatparêz ya hevalê "Mehmet Çimen" û guh bidin banga wî ya şoreşger. Dema ku em vê çalakiyê bi awayekî zanistî hildine destê xwe û binirxînin, emê bibînin ku ev heval di radeya herî mezin a mirovahiyê û şoreşgeriyê de ye. Divê bê ezîfî, em pir bi rêz û rûmet bin, ji-bo çalakiya vî hevalî. Pir silav û rêz û xwetewandin ji vê bîranîna xwediyê vê çalakiyê re.



# Şoreşgero bêmerde Selahattin Üçkardeş



nan jî, na diz ser de kay kerdo û xo cor ra vera cêr xîj kerdo. Ez xo jî, xîj ra mird nêbiyê. Ê seran de, mabênê Apoçiyân û Tirşikçiyân de hergî roj çosmê diz de lec vejyayê. Diz kewtê kê dest, kişta înan biyê zixm. Diz ra cêr, heta Evdal Axa û Mezelê Spê tirşikçiyân û dewletî; diz ra cor, heta Esmerçayir û Cereh Baba jî apoçiyân dest de bi. Şew û roj lec biyê. Ez kişta Apoçiyân de gird biya. Înan jew bi jew nezdî ra nêsilasnawa jî, min şoreşgerê ê wextî heme jî diyo. Rewşê ê şoreşgeran min çim vêr de qet nêşino. Werdiyina xo ra nata, şoreşgerî min aqil ra nêvejya. Ez vana çiyê jî hindê Apoçitay rûmet nêdano kesî. Emser welatperweran alâ cepî, diz sero akêrd û antî cor. Şarê Sêwreg, des seriyo ke rakewno, la belê newe newe yeno xo ser. Eke gurwe çewt nêşiro, sûka ma wo rew werzo linganê xo ser. Zey Qulp, Lice û şaristanê bînan pay kewo. Ez bawerê şarê xo bend.”

Embaz do delal û şîrîn Selhedîni rewşê Sêwreg, a kahan û newî, serâ neway û jewinî de winî ardê ziwân. Ey hazar seran ra nata herêm de çiçi ke biyo, analizê siyasî û sosyolojî miyan de ardê ziwân. Kokê probleman rind aşanayê. Aşanayin ra qet mird û eciz nêbiyê. Ey çiyê jî xo ver ra nêçekerdê. Wexto ke çiyê sero vinderdê, waştê heme kişt ra jî, rewşê ey çî bimûso. Biliheq jew roja ci jî

veng nêraverdê. Karî ra bol hez kerdê û bol xeftiyayê. Weşîna bêzahmetî ra qet kêfweş nêbiyê.

Ez nêzana ke ey senî biyara ziwân û bida naskerdin. Birazayê ci Deza Elîh Îhsanî, ma dabi silasnayin. Sifte ma sûk de ameyî pê hetek û embazîni kerdî. Ez Sêwreg de mûsawa ke, Selahaddîn jî Zankaya Marmarî de Fakûlta Teknîkî de, ebe waya Cafer Demirel, Bêrîvana waneno. Eya nezdiyê mengê, ma Sêwreg de piya geyrayê. Kotî de welatperwerê, kotî de roşnikarê û kotî de şarî miyan de

merdimokeko hezkerde esto, ey zanayê û silasnayê. Mabênê ey û şarî zaf weş bi. Ziwan ser de qisey kerdî, cok ra jî, qiseyê ci zaf sempatik bi. Bejnê ci mînyon, xoser û jidyaye bi. Şew roj sûk miyan de qe nêvîndernê û geyrayê, fina jî kesî şik nêberdê ci ser. Wexto ke merdimî dîr ra weynayê ci ra, catê qey ke rojê jî, ho sûk ra nêvjyawo û xeberê ci dinya ra çiniyo. Finê min ci rê vat: “Embaz, yan ti zêde biyê erbabê ney gurwî, yan jî ti ma xapeynenê. Eke senî beno wa bibo, ez yeqîn biya ke, to de cewhero gird esto.” Nê qisanê mi sero, Embaz Selhedîni sifte çarê xo qiriçna, awirê xo kerdê tirş û bahdo jî çend ke ci ra ame wiya. Rojê fina xeylê wiyabi û wina vat bi: “Heval ez tersena ke gamekna tiyê vajê; ti qandê çiçi nêbi hunermendê tiyatroy. Raştî jî şoreşgeranî rê tayne, hunermendîni jî lazim o. Tî nêzanê ke nê sükijê ma miyan de, çî fêsatî estê. Wa çiyê nêmusê, eke bimûsê saetê miyan de seranserê sûk de vila kenê. Bêqisanê veng û bêfêsatay heme çî jî zahmet wazeno. Wexto ke fekê ci abiyeno, ti vanê qey ke ey dinya ronawo û ey ser ra kes lacê piyê xo niyo. La belê ti tayn kewnê milê ci bin û çiyê ke zahmetfîno, çî rê akenê û xebat wazenê, vano: “Wa no gan oxirê to de şiro, ti ewtiyat vindi ez yena.” Mêrde şino û fina jî nino to hetek. La belê şarî miyan de, ê di qisanê to ra paştî gêno û roj deş finî şoreş awa keno. Wexto ke zanayin çinê bo, ters zerya kesî de zaf gird beno û merdimî xo miyan de fetisneno. Çiyê jî hindê tersî xerab niyo.”

Embaz Selhedîni jî zey birazayê wo Elî Îhsanî, şoreş nezdî ra silasnabi û werdiya xo ra nata kewtbi tesîrdê ci bin. Hûrdna embazan jî partî ra, serokatey ra, şarî ra û şoreşkeran ra rûmet girotê. Hûrdna jî pê manayê û qîmeto gird dayê pê. Embazan miyan de jî qedir û qîmetê înan zaf estbi. Weşîna înan de çewtin çinêbi. Çend ke înan dest ra ameyê, embazanê xo rê paştî vejyayê û gurweyê înan kerdê raşt.

Stenbol de ma piya xeberê şahadetê Elî Îhsanî girotbi. Ê rojan de kê ma de mendê. Ho, zaf embaz Elî Îhsanî ver kewtê. Sifte xeber nêda malbat; van beno ke xeber raşt niyo. La belê çend rojî tepya xeber no fin wina amê: “Embaz Elî Îhsan, 27’ê sermazî de awa Pêrî de fetisyê û aw ver de şî. Mayê geyrenê meytê ci. Xeberê dewijan esto, eke bivîne iyê xeber bidê ma.

Wa malbata embazî ci rê wayir bivejyê.” Na xeber sero embaz Selhedîni birazayê xo yo sükî rê xeber rişt. Şahadetê birazayê xo ra zaf zarî girotbi. La belê çiyê ci sere ra nêvejyayê, o çî jî wina ardê ziwân: “Piyê ci, birazayê min wo gird mamosta wo. Oyo bol ci ver kewo, îna di bira û wayê bi. Bira wo werdî jî tamam niyo.” Wexto ke nê qiseyî kerdê, ridê ci ra hincê hazar serî pay kewtî. Çend rojî tepya xeber amê ke, malbata ci, meytê embaz Elî Îhsanî ardo. Sêwreg û nezdiyê des hazar merdimî jî hewadawo. Na serwedarin tayn bo jî kêfê embaz Selhedîni ard ca. Na xeber sero wina vatbi: “Wexto ke şar şehidî rê wayir vejyeno, zerya kesî gird beno. Şoreş de şahadet ra vêrî, çiçi weş beno ke!”

Selehaddîn sero 1992’in de, Stenbol ra şî. Hindê serê Başûra Werdi de mend û bahdo jî raverd Başûra Gird. Başûrê Kurdistanê Gird de vêşî nêmend. Gerîla de namê ci Dîrok bi. Dîrok, Başûra Gird ra amê Cûdî û Cûdî ra jî şî Gabar. Oja ra jî şino Amed. Amed ra no fin yeno Stenbol. Stenbol de herêma Avcilar de sera 1997’î de, 22 Gulan de şehid kewt. Wexto ke Stenbol de mendbi jî namê ci yo şoreşgerî Ayhan bi. Panc serê weşîna ci, şoreş de ebe rûmet ra, ravêrd. Min meytê ci televîzyonê tirkan de dinê. Wexto ke min embaz Selhedîni televîzyonde di, finê ra adiro sîr kewt zerya min û zek ganê min ra rih ancîyê. Zey welatperweran vatê, serê ra vêşî na sûk de mendbi. Mabênê ma hind weş bi jî, rojê jî nêgeyrabi min. Ma di serî raveşî piya mendbi, rojê jî min rê telefonê nêakerbi. Ho şoreşgero weş bi û gorê peydayê lecê reyayinî û şoreşgeran xeftiyayê. Nê qaydan ra qet dîr nêkewtê. Şahadetê ci jî babetna bi. Xo ya jew dişmen jî berd. Weş nêkewt dişmenê xo dest û şahadetê xo ya terso gird, vist zerya înan. Hetê şoreşgerîni ra qaydewo newe, metropolan de ard werte. Ey şahadetê xo ya raya esasî, da şoreşgeran ver. Zek vajo: “Merg esto, dişmenî ra ters çiniyo. Weşêr bo paykewtina şoreşê reyayinî rê!”

Çi heyfo ke meytê şoreşger Embaz Selhedîni, baxajê otobojê Öz Diyarbekirî de şî Sêwreg. Wexto ke ho baxaj de bi, bira û waya ci tenya pa şî. Malbatî ci tenya Sêwreg de, bêveng dayî her. Zek vanê mezelê ci nezdiyê Deza Elî Îhsanî do. Ewro ded û biraza nezdiyê pê de, hera Kurdistanê de rakewnê.

ZÜLKÜF KIŞANAK


“**N**a sûk de, gûnî zaf herikyawo. Namê na diz Sebabaraq a. Sebabaraq werteyê Amed û Riha do. Diza Sebabaraq, Amed û Riha ra eke kewto kamî destî ro, a ser a kişt biyo zixm. Ewro keso jî, dîroka Sebabaraq rind nêzano. Goreyê dîrokşinasan diza sûka ma, gûniya koleyan ser de virazyawo. Zek vatenan diz, vêrî wina xeripyayê nêbiya, û qotê ci jî altûniya girote biyo. Ez vana qeçekê sûka ma, hemi-



□ 8-21.01.1195

**Kongreya PKK'ê pêk hat.**

Kongreya serkeftinê ya pêncemîn ya Partiya Karkerên Kurdistanê pêk hat. Di vê kongreyê de ji rêxistinbûnê bigire heta jiyana gel û stratejiyên cur bi cur gelek biryarên girîng hatin girtin. Yek ji wan biryaran jî guhartina ala partiyê bû. Di vê kongreyê de das û çakûç wekî nîşan û rewşa sosyalîzma berê hatin binavkirin û ji alê hatin derxistin. Di şûna wan de jî di alê de meşale hate bicihkirin.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 31 berfanbar:

31'ê meha berfanbarê destpêka meha Remezana 1997'an e. Remezana peyveke bi zimanê erebî ye. Ji peyva pir germ, an şewitînê tê. Li gorî hinek aliman, guneh di vê mahê de bi saya rojiyê dişewitîn, ji ber vê yekê ev nav standiye. Remezana meha dawî ya sê mehên pîroz e. Mehên beriyê Remezana Recep û Şaban in. Rojiya Remezana li ser misilmanên reşîbûyî û kamil ferz e. Di dawîya vê mehê de, cejna Remezana heye. Dewleta tirk rîvê ve cejna pîroz guhartiye kiriyê "Şeker Bayramı", jixwe diyaneta tirk destûra araqê jî daye.

## Çalakiya bîranîna şehidan hate lidarxistin

# Her tişt ji bo şehîdan



Roja 28'ê meha berfanbarê li NÇM'ya Stenbolê çalakiyek hate lidarxistin. Ev çalaki li ser navê şehîden mîna; Başak Kanat (Hêlîn), Nursen İnce (Sarya), Ali Temel, Abdulmelik Şêxbekir, Osman Yıldız, Kezban Kızıltoprak û Kamber Kaya û hemû şehîden tevgera azadiyê pêk hat. Di bernamêyê de nîşandayîna slaytê pêk hat, şano, folklor hatin pêşkêşkirin û helbest hatin xwendin. Serpêhatiyên xebatkarên NÇM'ê yên bi Hêlîn, Sarya û Ali Temel re jî di bernamêyê de bi riya sînevîzyonê hate pêşkêşkirin.


Di destpêka çalakiya bîranîna şehîdan de Seroka NÇM'ê ya Giştî Nuray Şen derbare şoreş û jiyana her heft şehîden NÇM'ê axaftinek kir. Piştî axaftina Şen, xebatkarên NÇM'ê di nîşandayîna slaytê de hin serpêhatiyên xwe bi şehîd Hêlîn, Ali Temel û Sarya re anîn zîmên. Serpêhatiyên ku bi dilekî germ û hestiyar hatin bilêvkirin, ji aliyê beşdar û malbatên şehîdan ve bi dilekî zîz ku kela girî xwe li qirka wan pêça bû, hate guhdarkirin. Her wiha di wê navberê de nameyek jî hate xwendin. Ev name jî di hejmareke Kovara Rewşen de hatibû weşandin. Nameya ku li ser navê şanogera şehîd Hêlîn hatibû nivîsîn jî di bernamêyê de ji aliyê şanoger Murat Batgî ve hate xwendin. Di wê nameyê de jiyana şehîdan, daxwaz û bîr û ramanên wan veşartî bûn. Di berdewama bernamêyê de diya şehîd Hêlîn Şahhanım Başak axaftinek kir. Ji rewşa diya şehîd Hêlîn xuya dikir ku nikare bipeyive. Dema ku diaxivî jî nikaribû hêstirên çavên xwe bigire. Şahhanım Başak, di axaftina xwe ya ku jê re zor dijiwar dihat de, hestên xwe wiha anîn zîman:

"Gelê ku ji aliyê dagirker û mêtîngeran ve hatiye xwestin ku ji holê rabe, ku wî gelî jî, xwe ji nav agir, îxanet û belengaziye û ji nav hemû dijiwariyên jiyana derxistiye û bi destê azadiyê girtiye û ew gel e ku ew daxwaza azadiyê li hemû bedena xwe belav kiriye. Li gel van yek me xwe di îmtîxanekê re derbas kiriye. Hûn hemû Hêlîn in. Riya wan riya me ye. Her wiha diya şehîd Hêlîn çarîneyek jî ji bo bîranîna wan xwend. Piştî helbest xwendinê listika 'TA' Sê Ewrên Dûr' berî ku Hêlîn şehîd bikeve di nav de rist girtibû ji aliyê Teatra Jiyana Nû ve hate pêşkêşkirin.

Di dîmahîka bernamêyê de axaftinên xwişk û birayê Şehîd Sarya, Yüksel, Güneş û Burhan İnce ji sînevîzyonê hatin pêşkêşkirin. Malbata Sarya di axaftinên xwe de diyar dikirin ku, şehîdketina Nursen li ser wan gelekî bandor kiriye. Tevî vê yekê jiyana wan jî hatiye guhartin. Malbata Sarya dadixuyîne ku piştî çûna Sarya ew bêhtir bi têkoşînê ve hatine girêdan. Malbata Şehîd Sarya her wiha derbare jiyana Nursen de dîtî û ramanên xwe bi hestekî hem xemgîn, hem jî dilşad, dianîn zîmên. Piştî slaytê listika bi navê "Govenda Hilo" ya Teatra Evîna Welat ji vîdeoyê pêşkêşî gel bû. Her wiha Sarya jî di nava vê listikê de rol girtibû.

Di dawîya bernamêyê de koma folklorê ya NÇM'ê koma Serhildan di listika xwe ya ji bo şehîdan de bi kincên gerîlayan derketin pêşberî beşdaran. Wekî tê zanîn Sarya di koma serhildan de demeke dirêj cî girtibû.

A. WELAT/ STENBOL

**ÇAVDÊRÎ****Pirsa serxwebûnê**

MİRHEM YIĞIT

Ev demek e di nav mehê de carina yek û carina jî du semîner li Înstîtuya Kurdî li Stokholmê tene lidarxistin. Dabaşên semîneran cur bi cur in û semînerdar jî di aliyê siyasî û fikrî de naşibin hev. Hin di zemanê xwe de birêveberên rêxistinên bûn, niha lêkolîner in, hin dîroknivîs û hin nivîskar in. Hin jî Bakur û Başur in û hin jî ji Rojava û perçeyên din in. Zaravayên semînerdaran jî carinan kurmançiya dora Amedê, carinan soraniya murkî û hin caran jî ya Silêmaniyê ye. Înstîtû dibe navnîşan û navendeke hevdu-naskirina akademîsyen û zanayên kurd û cihekî munaqeseyên herşaxî. Ya rast û baş jî ev e: Înstîtuyek divê neteweyî û singîfreh be. Reng û fikrên neteweyî ji bo Înstîtuyekê xurtî ne. Singîfrehî û çalakiya fikrî rewşenbîr û xwedî-qeleman dikişîne û ew yek ji bo Înstîtuyê dibe prestîj û nav.

Semînera dawî li ser 'Başûrê Kurdistanê û dewletên dagirker' bû. Semînerdar doktorê dîrokê Kemal Elî bû. Di beşa duyemîn de, di atmosfereke bi aram û li ser xwe de, munaqeseyên berdar çêbûn. Beşdarên nîqaşan li ser du xalan zêda sekinîn; yek pîrsa 'mandatiyê' û ya duyemîn jî meseleya serxwebûnê bû. Divê mirov li pîrsa serxwebûnê mîna pêvajoyê û prosekekê binêre. Li welatekî mîna Kurdistanê serxwebûn ne meseleyeke ku bi derbekê re û bi carekê re bê. Ev ewil di fikrê de dest pê dike, di mîjî û dilê mirov de dikeve kar. Piştî re sistematîze dibe, li qalibê serberiyê dikeve, dibe îdeolojî. Îdeolojî di riya siyasî û rêxistinê de dibe program û malê gel, bi slogan û taktîkên rojane xwe radipêçe û rêz bi rêz avahiya serxwebûnê ava dike.

Kesên ku zanin serxwebûn çî ye, dibînin ku gelê kurd û welatê me Kurdistan her roj hinekî din serbixwe dibe û çend kilometreyên din ber bi serxwebûnê ve diqedime. Neteweyên serbixwe xwedî esker in, xwedî artêş û hêzên ewlekariyê ne, yê me jî, îro em dibin xwediyê hêzeke çekdarî û berdewam. Serbixweyî bi rengê avakirina desthelat-dariyêke merkezî ku jê re dewlet tê gotin, jiyana bi rê ve dibe û pîrgirêkên civatê yên hundir û derve jî ve merkezê çareser dike. Organîzebûna kurdan û merkezîbûna wan jî roj bi roj neteweyî dibe, hinekî din firehtir, hinekî din welatgirtir û Kurdistanîtir dibe. Neteweyên serbixwe xwediyê zanîngê, akademî û sazîyên her-rengî, xwediyê organên fikrî, rojane û demdemî ne. Yên me jî înstîtû û dezgehên me çêdibin, çapemenî û rojnamegeriya me di nav ya cihanê de cihê xwe çêdike û ji awira kadroyên wan ve, ne bêkêmanî be jî em jî heq xwe derdikevin, di bin barê xwe de radibin: Ji bo serbixweyî neteweyî rola medya; radyo û televîzyonê zêde mezin e. Dewlet, karmend û siyasatmedarên dewletê rasterast bi riya medya xitabî bask û tebeqên gel dikin û rojê çend saetê be jî, hema dikevin her malê. Kurd jî, îro xwedî radyo û televîzyon in, xwedî alternatîf û kemalên xwe ne. Dawî serbixweyî û dewletê bê butçe-nabê. Kurd jî xwedî butçe ne. Butçeyê neteweyî çêdibe. Ev butçe deman û garantiya geşbûna fikrê, kultur û felsefeya serbixwebûnê û giş çerxên aşê neteweyî ye. Her wiha dibe stûn û dilê baweriya bi xwe, hêz û karîna xwe û çend gavên din dîrketina ji bandora koledar û dagirkeran.


Her sala di ser şervanên me re derbas dibe, her meh û sal dezgeh, çapemenî û medya me bi tementir dike, rêzeke din dixê ser avahiya serxwebûna me. Em her deqîqe û her kêlî serbixwetir dibin. Serxwebûna temam jî ne dîr e.



# Hunermendê ku Heke em masî bin, t

## HOZAN BARAN KÎ YE?

Belê, ez di sala 1956'an de hatime dinyayê, bi eslê xwe ez ji Xozatê me. Navê gundê me Bargenî-Axûçand e. Ji me re Axuçaniyan dibêjin. Axuçani seyîd in. Herema Axuçaniyan bi nav û deng e. Ez ji malbateke kurdewarî tîm. Her tim di mala me de zimanê kurdî hatiye axaftin. Bavê min Mahmûd Baran bi xwe jî hunermendekî navdar bû û gelek kasetên wî hebûn. Li keman û tembûrê dixist. Ev 19 sal in ku ez li Ewrûpayê li dewleta Almanyayê dijîm, di sala 1978'an de ez ji ber sîstema tirk reviyam. Niha ez li bajarê Kalshaure ya Almanyayê dijîm.



**We kengê û çawa dest bi muzîkê kir?**

■ Belê, wekî min berê jî gotibû bavê miş Mahmûd Baran hunermendekî navdar bû, kasetên wî jî hebûn. Birayekî min jî hunermend, mûzisyen e. Di sala 1976'an de li Xozatê şahiyek çêbûbû, min wê rojê dest bi karê muzîkê kir. Beriya vê tarîxê li dibistana min stran digotin, feqet bi tirkî.

**Heta niha we çend kaset dagirtine?**

■ Heta niha min heft kaset bi awayên profesyonelî tijî kirine. Pênc heb ji wan li Ewrûpayê, du heb jî li Tirkîyeyê. Navê wan bi rêzê ev in: Lo Were (1981), Deriyê Hepisxanê (1984), Ey Dêrsimê (1987), Helebçe (1989), Çênê Çênê (1991), Destê Ma (1993) û Çênê çênê careke din jî di berfanbara 1997'an de ji aliyê Ses Plakê ve li Tirkîyeyê hate tomarkirin. Di kasetên xwe de ez zaravayên kurmançî û zazakî bi kar tînim.

**Hûn staranên kirmanckî (dimilkî) û kurmanckî dibêjin. Gelo hûn xwe bêhtir nêzikî kîjan zaravayî dibinin?**

■ Niha rastiyek heye ku dayika min kurmanç e, lewre jî zimanê min ê zikmakî kurmanckî ye. Di kasetên xwe de stranên ku ez dibêjim bi piranî kurmanckî ne. Lê hindik be jî ez bi zazakî (dimilkî) dizanim. Stranên zazakî bi gelemperî zargotinan berhev dikim. Di her kaseteke xwe de 2-3 stranên bi zazakî dibêjim. Bêşik pêwîst e ku em di tevahiya berhemên kurdî de 4 zaravayên kurdî (kurmanckî, zazakî, soranî, goranî) bidin xebitandin, ji bo ku ev ziman hin bêhtir bi pêş bikeve.

**Navbera we û MED-TV çawa ye?**

■ Navbera me gelek baş e. Heta ni-

**Lî rûyê dinyayê tu kes nayê dîtin ku tîkîliya xwe jî siyaseta cuda bifikire. Mesela îro ez jî nên dikirim û ez jî jî vê buhabûnê aciz dibim. Dibe ku hinek stran hebînin ne politik bin, folklorîk bin û hunerî bin, li ser eşq û evîne bin. Lê pêwîst e ku stranên politik hebînin da ku derd û kesera welat binînin zîmên.**

ha 5-6 bangî me kirine em çûn û me programên xwe çêkir. Carekê di bernamaya alewiyan de, du caran di bernamaya Şox û Şengê de ez beşdar bûm. Carek jî tevî koma xwe em beşdarî bernamaya Kazim Timurlenk bûn. Ew bername li ser stranên kirmanckî bû.

**Bi giştî dema mirov li kasetên we guhdarî dike, bêhna folklorê ji stranên difûre. Hûn rewşa folklorê kurdî çawa dinirxînin?**

■ Bêguman pir meseleyeke girîng e. Dixwazim derheqê folklorê kurdî de gotineke kesekî biyanî binim zîmên: "Li jor bombe dihatin xwarê, lê kurd dîsa ji direqîsîn." Bi vê gotinê jî diyar dibê ku reqs, gotin, kilam, folklor û zargotina kurdî gelek deng vedaye û girîng e. Vê gavê nişên nû rabûne, awaz û gotinên nûjen, rock, pop û jazzê bi kurdî şrove dikin. Lê kesên ji 40 salî û hevrax mîna min di navbera zargotinên kevnare û îro de bûne wekî pir. Bi kurtasî eger em masî bin, folklorê kurdî behr bi xwe ye.

**Her kes dibêje ku folklorê kurdî pir dewlemend e. Hûn di vî warî de dikarin nixandîneke çawa bikin?**

■ Temel jixwe ew e. Hege ev temel tunebûya îro em ne li vê derê bûn. Bavê min bi xwe ji nav vê rewşê derket. Stranên Yerewanê digotin, ji biçûkahiya xwe ve me li "Dengê Êrîvanê" guhdarî dikir. Her êvar deng û awazên Meyrem Xan, Mihemed Arîfê Cizrawî, Aramê Tîgran, Garabetê Xaç û hwd. dikete nav mala me û ev deng û awaz em dibirin dinyayê nû û dianîn. Jixwe bîngeha dîroka kurdî, ji ber ku berhemên nivîskî tunebûn bi kilam, folklor, lorîkên dayikan û lawjeyên dapîran heta îro hatine...

**Yanî hûn dibêjin edebiyata kurdî di warê devkî de pêşketiyê ne ku di warê**

**nivîskî de?**

■ Bêguman rast e! Nivîs her dem qedexe bûye li Kurdistanê, lê serdestan tu car nikaribûye zîmên qedexê bike. Niha tu dikarî zîmanê dayikê bibîrî? Na!.. Ji ber ku dayik kul û kesera xwe, axî û loriyên xwe bi zîmanê xwe dibêje.

**Di çêkirina kasetan û piştî derketina kasetan de çi pîrsgirêk derdikevin pêşberî we?**

■ Vê gavê ji bo derxistina kasetan pîrsgirêk nayên dîtin. Bîngehek ji bo çêkirin û afirandina kasetan heye. Lê pîrsgirêk piştî ku kaset derdikeve peyda dibin. Aloziya mezin jî belavkirina kasetê ye. Em dikarin salê 9-10 kasetan ji derxin lê gelo emê wan çawa belav bikin; pîrsgirêk di vir de ye. Pîrsgirêkeke din jî ji aliyê aborî ve derdikeve, her ku em kasetekê çêdikin em di zerarê de ne, ango em jî kîsê xwe didin. Gelek caran tomargehên Unkapanî ji me re wiha dibêjin: "Bira dev jê berdin kasetên kurdî nayên firotan, pir pir 40-50 hezar difroşin." Ev jî ber çî ye, ez jî baş nizanim an buha ye, kurd nikarin kasetan bikirin an nakeve destê wan an jî tene qedexekirin. Mesela kasetê min a bi navê "Destê Ma" jî hêla waliyê Wanê û çend qeymeqaman ve hatiye qedexekirin. Min bihîst ku qoriciyekî jê re ev kaset tercûme kiriye. Piştî re jî hatine "Özdemir plak" ê û dest danîne ser kasetan û muvakatname jî destê wan girtine.

**Hûn jî zehf ji destê tomargehên korsan dikşînin an na?**

■ Jixwe zîrara giran ji wan tê. Tişteke nakeve berika me. Em kasetan çêdikin, zirarê dikin û ew berikên xwe tijî dikin. Ev bê ehleqî û bênamûsî ye. Ji ber ku kasetçiyên korsan li ser dîrok çand û hunera kurdî a pîroz xwe didin jiyandin, ked û nixên





# Êd Hozan Baran: Folklorê kurdî behr e

gelê kurd bînpê dîkin, navêroka wê vala dîkin û vê çandê difiroşin. Êdî dilê me naxwaze ku em kasetan çêkin, lê ji ber gelê xwe em çêdîkin, tu car em ji bo pereyan vê yekê nakin.

**Li gorî ramana we divê têkiliya siyaset û hunerê çawa be?**

■ Ji hev cudabûna siyaset û hunerê ne gengaz e. Li rûyê dinyayê tu kes nayê dîtin ku têkilîya xwe ji siyasetê cuda bifikire. Mesela îro ez jî nên dikirim û ez jî ji vê buhabûnê aciz dibim. Dibe ku hinek stran hebin ne politîk bin, folklorîk bin, zargotînî bin û hunerî bin, li ser eşq û evînê bin. Lê pêwîst e ku stranên politîk hebin da ku derd û kesera welat bînin zimên. Îro siyaset di kilam, lawje, loriyan bi xwe de jî heye. Ji ber ku bi sedan sal in kurd têne perçiqandin û asimîlekirin, îro neyar leşker, polis, tîmên taybet û cerdevan in, lê duh axe, şêx û beg bûn û di stranên wan deman de jî gel nerazîbûna xwe di van stranên de dînanî ziman.

**Hûn dibêjin di stranên dengbêjan bi xwe de jî siyaset heye?**

■ Heye lê! Mesela Şakiro heye, Zahiro heye. Çi dibêjin? Diavêjin dewletê, her dem peyva contirk û romiyan bi lêv dîkin û zilm û zordariya wan li hemberî gelên bindest tînin zimên. Bavê min bi xwe jî di kilamên xwe de Qetlîama

Dêrsimê diqîre û wiha dibêje: "Dayê narim Xozatê, Sağiroğlu li min dixê bi qondera...."

**Hûn di kar û barê hunerê de saziyên kurdan çawa dibînin?**

■ Niha li gorî 20 sal berê gelek pêşketin hene. Wê gavê dema me bi kurdî digot, me kes li dora xwe nedidît. Tirs hebû qedexebûn hebû. Lê îro li Kurdistanê û li derveyî welat çiqas kovar û rojname derdikevin em nizanin, lewre pir zêde bûne.

Bi rastî ji divê tevahiya saziyên me xwe rêkxistîtir bikin, xwe wekî dewlet bihesibînin û ji hev hez bikin. Çiqas partî, rêxistin û sazî nêzikî hev bibin, ew qas nêzik dibe azadî... bi kurtasî divê sazî û hunermend hev temam bikin....

**We berî niha got Hunermend ji siyasetê cuda nayê fikirin. Hûn der heqê dagirkirina Başûrê Kurdistanê de çi difikirin?**

■ Berî her tiştî ez dixwazim bê fêhmîkirin ku ez ji şer hez nakim, her dem ez dixwazim aşî, azadî û wekhevî pêk were. Nexwazim ez qet naxwazim ku di nav kurdan de pevçûn û şer çêbibê. Ji bo kurdên Başûr îmkaneke mezin çêbûbû, lê ji ber bêkêriya wan, ev fersend ji dest wan derket. Îro em dibînin ku 3-4 mehan carekê artêşa tirk bi sed hezaran leşker, tîm û ceşan başûrê Kurdistanê dagir dîke.

PDK jî yarmetiyê ji bo artêşa tirk dîke û êrîş dibe ser şervanên kurd û gelê sivil. Divê tevahiya kurdên şoresger bibin yek, dijmin diyar e, bila tîrên xwe arasteyî neyar bikin. Sedema şêrê Başûr politîkayên siyonîst, tirk û amerikiyan e. Hinek kurd ji di destê wan de bûna wekî xulamok...

**Bi qasî ku ez dizanim, hûn Îzzettin Doğan ji nêz ve dinasin. Ew xwe wekî pîr û serokê elewiyan dihesibîne. Hûn dikarin der heqê wî de çi bibêjin?**

■ Belê rast e, ez wî ji nêz ve dinasim. Sextekarekî mezin e. Li ser wî min çend nivîs jî ji bo rojnameyan nivîsand.

**"Dewlet tu car bi fizîkî li Dêrsimê bi ser neketiye, nikaribûne bedena xwe bixînin Dêrsimê. Ji ber xê sedemê asimilasyon bêhtir di çand, ziman û bîrdozê de pêk hatiye. Îro jî gelek kurdên elewî ku hunerê çêdikin stranên ku eslê wan bi kurdîne, dîkin tirkî."**

Ew bi xwe dibêje ez tirk im. Rôjekê jê dipirsin: "Gelo hûn xwe ereb an jî tirk dihesibînin, hûn çawa dibîne elewî ew kese ku ji aliyê Hz. Alî ye. Ji Aliyê Hesen û Huseyin e." Wiha bersiv da ye

Em ji hev re dibêjin kirîv û nizam çî....

Elewitiya Îzzettin Doğan kemalist e. Esas ew elewitiyê ji nîzane, xwe wisa dihesibîne û ji xwe re cihêkî çêdike. Niha tu gazî wî bikî bibêji, "Ka beyteke elewitiyê bibêje?", nîzane bibêje.

**Di çanda kurdî de zaravayê kirmancî bi taybetî ji kirmancîya Dêrsimê**

xwedî sta-


tûyê ke taybet e. Nema-ze tê dîtin ku di 'deyîşan' de gelek caran jî stran ji aliyê melodîk ve kurdî ne lê gotinên wan bi tirkî ne, hûn dikarin der heqê vê yekê de çi bibêjin?

■ Rast e! Jixwe herêma Dêrsimê, ji layê asimîlekîrinê ve para herî giran girtiye. Ev yek ji çandê bigire heta jiyana mirovan xwe bi awayekî zelal nîşan dide. Asimilasyonêna kurdan ji beriya ve Osmaniyan dest pê dîke. Ji Asyaya Navîn ji 3000 hezar kilometre dûr li ser hespan hatine, li Anatoliya û Mezopotamyayê bi cih bûne û gelên ku şeş hezar salan bêhtir li ser vê xakê ne kuştine, asimîle kirine û li ser mîrata wan rûniştine. Ew gundiyan tirk ku li derdora Dêrsimê ne jî di dema Yavuz Sultan Selim de anîne. Dewlet tu car bi fizîkî li Dêrsimê bi ser neketiye; nikaribûne bedena xwe bixînin Dêrsimê. Ji ber vê sedemê asimilasyonê bêhtir di çand, ziman û bîrdozê de pêk hatiye. Îro jî gelek kurdên elewî ku hunerê çêdikin stranên ku eslê wan bi kurdî ne, dîkin tirkî wekî mînak Arif Sağ, Yavuz Top û hwd.

**Stranên ku hûn dibêjin li ser kîjan temayî ne?**

■ Niha ez, mirovekî siyasî me, bi sala ne ku ez li Ewrûpayê me, nikarim zêde werim welat. Ez xwe wekî pirekê di navbera çanda kurd û çanda Anatoliyayê de dibînim. Muzîka ku ez çêdikim klasîk e. Bi taybetî ez li ser welat, Dêrsim dil û evînê dibêjim.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ





# Helbestine bijarte

(Ji bo biranîna heval Nursen Ince)

## Bayê Sarya

Dîsa zingîn û qîjîn diçe, ji dilê min  
Di şefeqa sibê de  
Cemed digire bi bayê sibê re  
Dilê min ê xemgîn  
Di nav de dengê Sarya tê.  
Bênalîn û bêgirîn, tenê qêrîna wê heye,



Bi qasî qêrîna Gurbetellî bilind e

Ew Sarya ye, dilê wê ji pêta agir

Germa xwe daye Sarya Zaxros.  
Bêwestan e ew, hunermenda  
jiyanê ye.

Bi şêr û xezalan re direqise  
Ew reqsa şoreşê ye,  
Li qûntara Çiyayê Bêxêr  
Reqsa wê ji dil tê, ne ji rû ye  
Qor bi qor zêde dibe li dor Zapê  
Reqsa giran dibe, dijwar dibe  
Zagros jê emanê dixwaze.

Ew Sarya ye, Sarya di sariya  
sibê da  
Ew Sarya ye di pêş singa çîyan  
de

Di reqsa azadiyê de  
Sivik, nerm û narîn e hejîna wê  
Li haweyê wek pereki ditayise.  
Wek bazekî ye li semayê, şînda  
şewq e  
Bayê baskên wê sariya payizê ye  
Li ser xaka xwîn girtî.

Ew Sarya ye Sarya di sariya sibê  
de  
Dilê min diferike ji hev,  
Bi agahiya nebixêr  
Agahiyek Gurbet e, yek ji Sarya  
ye.

Giraniya Çiyayê Agirî tê ser min  
Baskên min dixulxulin ber min  
Dilê min hedan nade, dixwaze,  
Wek Dicle û Ferat, wek awa  
Zapê,

Bê wargeh biherike nav deryan  
Dilê min dike biteqe ji axîna te.  
Li ser sêla sor e, sêla tifika azadî.

Dema fezayê ye, em mane li erdê,  
Lê êdî em jî bi fezayê dikevin  
Bila bizanibin yên nizanin  
Xelq û alem bi stêran ve diçin  
Ê me Sarya û Gurbet stêrin.  
Ew ne li Kolombiya ye,  
Ew li Zapê, li ser Çiyayê Zagros bi hewa dikevin  
Dest didin hev bi stêran ve diçin  
Ew Sarya ye Sarya  
Di Sariya pâyiza not û heftan de  
Piştî oxirkirina mijdarê, diçe

HASAN HARAN/ BARTIN

## Dilê min ji bo Zapê diavêje

Kela dilê min dîsa gur bûye  
Wek kela dilê Xeyrî  
Ji bo Zapê davêje  
Tenê carek bi dîtina te, Zap  
Ji min re wek qiblegehê  
Awireke tûj wekî awirên Kemal  
Binêrim lê bes ji min re  
Êdî naxwazim tu tişteki din  
Tenê carekê şer bikim li bin zinarê te  
Wek Alî, wek Akîf  
Rojek bi nanê tîsî  
Çend şevên bê xew  
An jî çend rojên bê av  
Di bin tîrêja tava tîrmehê de  
Bi sincirim, sor bibim û biteqim  
Wek bombe  
Silavekê germ bidim Yazdan Şêr  
Hevala Zilan û wek wê  
Carekê wek Hozan, carekê wek Seyran  
Mîna Ömer, mîna Dicle  
Biherikim ji nav dilê Kurdistan  
Pêl bidim li ser sinoran  
Bibim lehî, bibim tofan  
Li xayîna rabim  
Wek xezeba Zagros di ser wan de werim  
Dîsa dilê min kew nabe  
Dîsa min divê biteqim car bi car  
Dilê min ji bo Zapê, ji bo şahiya wê  
Ger tenê rojek bijîm  
Lê bila Zap be, li bin kendaleki wê yî sar  
Qurçek awa Zapê  
Nadim bi bihuşta ebedî  
Hevaltiyeke bi gerîla re li Zapê  
Her weke azad bibe mirovahî  
Lewra Zap komara mirovahiyê  
Zap tîrsa dilê neyara  
Zap pêşeroja gelan  
Zap dilê Welatê Rojê  
HARBÎ SOYLU

## Warên koçberiyê

Dilê min	Ji tariya gemar
Hey felek were	De biparêze heval û hogiran
Were biqelêse dilê min	
Jê çêke qesr û gonaxan	Zarok ên pêxwas bê libas
Ava bike	Dayik û bavên me
Bi xwînê wênêkirî	Ketin tax û kolanan
De biparêze ji hatineke tarî	Ew rê nenas
De biparêze zarokên koçberiyê	Digerin li ser sergoyên koçik û tolan
Were were felek	Li pariyek nan li pîneyek bi star
Were bigure çermê laşê min	
Jê çêke çadir û xirbetan	Dibare dibare dilop dilop baran
de biparêze dayik û bavên min	Jor de tê
Ji fîzefîza ba, ji dilopên baranê	Di hundirê konê penaberan
Were were	Bes e bes e
Were derxe felek	Hey bimîne wêran
Derxe her du çavên min	Hey mirovahî hey cîhan
De bila ronî bike	Ma jîyan ji me re nîn e...
Di şeva tarî de	

AMED HELWENDI



Li Navenda Çanda Mezopotamya 'ya Stenbolê

● 03.01.1998 Şemî: Teatra Jiyana Nû: "Ta/ Sê Ewrên Dûr", saet: 14.00

● 04.01.1998 Yeşkem: Konsera Koma Agirê Jiyana, saet: 17.30

Li NÇM'a İzmirê

● 03.01.1998 Şemî: Konser: "Karxezalin li Çiyayê Nemrûdê", Hozan Cezmî, saet: 18.00

● 04.01.1998 Yeşkem: Şanoya Hêvî: "Gurî", saet: 18.00

### CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'ê

● 04.01.1998 Yeşkem: Panel: "Di tevgera karkeran de pêşveçûnên dawîn û meşa Enqereyê"

Axîfger: Munzur Pekgüleç (Derî-lş) Hatice Pehlivanoglu (KESK) Çetin Uygur (DISK) Celal Meral (rojnameya Dayanişma) Rêveber: Metin Kozan, saet: 15.30

Li MEDKOM'ê

● 03.01.1998. Şemî: Semînera Felat Dilgeş: "Gulek ji baxê Îremê Botan; Melayê Cizîr", saet: 17.00

Serêko HADEP'a Stenbolê Av. Mahmut Şakar:

## Sala 1998'an jî wê bibe sala kurdan



HADEP'a Bağcılarê roja 31'ê berfanbara 97'an ji bo sala nû bernamêyeke bi navê "Sersaleke Alternatîf" li dar xist û bêhtirî 1500 kesî beşdarî wê bernamêyê bûn. Di destpêka bernamêyê de serokê HADEP'a Bağcılarê Asım Özcan sersala gelê kurd pîroz kir û wiha got: "Em hêvîdar in ku wê sala 1998'an ji gelê me re aşî, azadî û wekhevîyê bîne." Pişt re "Koma Ehmedê Xanê" ya folklorê bi listikên Bedlîsê derket pêşberî gel û çepik ji beşdaran girtin. Di nav beşdaran de Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar jî hebû û wî jî axaftineke nixandî kir. Şakar wiha got: "Gelê kurd di sala 1997'an de jî bi zilm û zordariya dijmin re rû bi rû maye. Di sala 97'an bû sala gelê kurd, bû sala azadiyê. Ev çosa mezin ku wê gavê em tê de dijîn ji bo pîrozbahiya serkeftin û azadiya me ye. Ez hêvîdar im ku wê sala 98'an jî bibe sala gelê kurd. Li ser navê Mazlum û Mahsum ên ku em bi saya wan gihîştine wê merhaleyê, ez sersala we pîroz dikim. Sersala girtiyên zindanan, ên li Zagrosan, ez sersala Kurdistanê sersala zarokên agir û rojê pîroz dikim." Pişt re jî endama meclîsa partiyê ya HADEP'ê Melike Alp axivî. Alp di axaftina xwe de anî zimên ku saleke tîr-tîjî derbas bûye û wê bal kişand ser operasyona Başûr û wiha got: "Em jî 97'an re silavê xwe dişînin û 98'an jî li gelê kurd û li dinyayê pîroz be." Pişt re Serokê

Komîsyona Ciwanan a HADEP'ê Aydın Pervani li ser amadekirina sersala Alternatîfê axivî. Pervani "Divê em di her warê jiyana de alternatîf bin. Ev yek pêwîstiyek e. Divê her tiştê nû, cihê yê kevn bigire. Her çiqas em di hundirê wê pergala dewletê de dijîn jî, divê em ji her alî ve dijber bin. Mantalîteya me ya evîni, mantalîteya malbatî divê ji wê pergala re alternatîf be. Encax em dikarin wisa bi ser bikevin."

Ber bi dawiyê, Koma Azad û Koma Çiya bi helbestên xwe çosêk mezin da beşdaran. Di nav bernamêyê de bi navê "Sâeta Serbest" ku beşdar dihatin ser sahnê û helbest û mesajên xwe dixwendin, bû sedema eleqeyê mezin.

Pişt re mesajên ku ji şevê re hatibûn, hatin xwendin. Di nav mesajên de ya herî balkêş mesaja Rojnameya Ûlkede Gündem bû. Di mesajê de wiha dihat gotin: "Di sala 97'an de hate xwestin ku îradeya gelê kurd bê şikênan, lê bi şervanên xwe, bi berxwedanên xwe, me polîtîkaya qirkirinê di avê de bir û bi kongreya neteweyî û bi serokatiya neteweyî sala 97'an bû sala finalê" Pişt re mesaja Kovara Yurtsever Gençlik'ê hate xwendin. Ji bilî van, mesajên Komeleya Xebatkeran Avahiyân (Înşaat Çalışanları Derneği) û İnsiyatîfa Komeleyên Jinên Azad hatin xwendin.

ŞÊXMÛS ÖNAL

### TÎŞK

## Serva mi gamade newî



KAZIM TEMÛRLenk

Ma be xêr di wendoxê delalî. Hata nika çend rey mi fikir kerd ke Azadiya Welatî rê niwîs binûsnî, hama tîvar nêkerd. Çike însôn wazeno ke hem hete zon ra, hem kî (jî) hete mesaj-ra, boyna niwîsanê rindon binusno. Hata ewro zon sero kemiya mi zaf biye, hona çî kemiye esta. Eke xo ra vajîme kemiye, game nêşikîme raver berjîme. Nayê ra, di sero nem ra raver, waxto ke mi dest kerd televîzyon raşt çî werte qesey kerdena mi de lete (nîme) ra zede tirkî eşt bi. Mezgê ma henî bibî. ke, ti vana ebe zeçe cixara muniyay bî. Çe, rayê axsata (ticaret), karê xo de boyna tirkî qesey kerdê. Senik mend bî ke, zone ma û piye xo, xo vîr ra bikerîme. Hama qewxa (lec) xelesa, kimanco zof zof (vêşî) çî qafîka mawa huskerde pinciley. Ma gereke game biestene, mi çî henî kerd, ebe programe "Ware jele" dest kerd ci. Çitir ke mi raver çî vake, kemiye eşt bî, hama eke însôn tawa nekero a kemiye boyna ramena. Ewro cayê de çîrokê mi de wendene, wazon ke nayê sima rê binusnî. Kurdistan de feqîre beno, pesewe peroz sono camiye, qe sate û deqa waxte nimey ra peyser nêmaneno. Milê hergu roz wejdano, vano kam ke zerne dano feqîr e, heq hawt zerno dano ci. Boyna niya vano. Ê na feqîr çî, cayê kose de zerne de xo biyo. Roze eke onca Milê vano kam ke zerne dano feqîre, heq hawt zerno dano ci, feqîr vejîno sono çe, vano cînî biya yî zernî bide mi, berî neçarî derî. Cîniye vana la law, verva ma zimistan o, çe de ne ard ye, ne kî (jî) îmise esto. Belka beme ebeyî zernî, axsata xo keme. Mormek vano, îlla bide, milî niya vato. Axrî ceno zernî beno dano neçare de heqî. Roj verene ra, ne zernî yene, nekî hale xo beno rind. Sesadire xo ceno vejîno sayd, vano belka neşîbe vejîno, an çe de domanî vesaniye ra qir nêbene. Sono feçe axwe de, vejîno dare ser, vano belka tawaye eno axwe ser, non pira bon çe. Xele ke waxt vereno, mormeqe eno bine dare de nîseno ro, tûrûçe xo ra nona de qize vezeno. Raver none keno çor letey, desmale sero nano ro. Jowû re vano to heq a, jû rê vano to Mihemed a, jû keno Alî, jû çî keno. Cebrail. Raver Alî ceno xo dest vano to Aslanê heq biya, heqî peyxamberîne to rê liyaq dî, hama Mihemedî to dest ra guret, to nêşkiya tawa ye bikere, to won, lete nonî weno. Dima Cebrail ceno xo dest, vano heqî Qurane bavoçe to kerde ke bere Alî dere., to çayê vatena heqî ne kerd, berde de Mihemedî? Ayê çî weno. Nafa Mihemedî ceno xo dest, vano peyxamberîne heqa Alî biye, to çayê be mextîne kerde? Yiçî weno. Sire yeno heqî, vano to vana ez hergu çî zanon, vînon, çayê Cebrail xelet kerd, to nêzana, nêdî? Eno ke boro, feqîr cor nano mormeqe ra kîseno, vano, a çî heqa min a. Dare ra eno war, lete nonî ceno weno. Werte tûrûk de niyadano ke hawt zernî este, ceno sono çe. Onca eke sono camiye, Milê onca vano, kam ke zerne dano neçarî, heq hawt zerno dano. Nayê de, feqîr urzeno ra, vano heq dano hama, hata ke tufang miyare ci, nêdano.

Ma çî hata ke dest nustene nekerîme, kes zone ma, ma nêdano.



# Çîroka Kalê bêguneh

## D Pêvedana mozên sor

Destpêka biharê bû. Zivistan hêdî hêdî diqediya û şûna xwe ji bihara rengîn re dihişt. Li quntara çiyayên welatê me hêj belekiyên berfê xwe li hin cihan didan xuyakirin. Qîz û xortên gundiyan amadekariya derketina çolê dikirin. Kalê ciwan ê bi navê Hekîm dest bi nivisandina dîrok û jiyana xwe kiribû. Li her herêmeke welêt şahiyek dihat lidarxistin. Govend bi stranên ku li ser jiyana Apê nemir dihat gotin; ji heft salî heya heftê salî mirov radikirin ser piyan. Bi kêf û şahî qîz û xort, kal û pîr li hev diciviyên, hinan reqs dikir, hinan jî, ji bo hatina roja nû xwe kêfxweş dikir. Bahara rengîn raman quwet û hêzeke xurt dida gundiyan, her birewerek dibû mîna Rûstemê Zal.

Ji nava gund refek qîz û xort ji bo çimîna kereng, sosin û nêrgizan di destên wan de gulên rengîn ber bi rojhilatê welatê xwe ve dimeşiyên. Xatirê xwe ji dayîk û bavên xwe xwestin û berê xwe dane ser çiyayên ku qebeqeba gozel û çîkeçîka bilbil û şalûlan jê dihat.

Belê, hin ji wan gihabûn nav zeviyên çolê û dest bi komkirina zadê rojane dikir. Li hêla din govenda qîz û xortan geştir dibû. Cotkar, şivan û gavanê gundiyan jî, pez û dewarên xwe berdabûn mîngên derdora gund û diçerandin. Berxvanê ku berxên xwe berdabûn kêleka mîngê û listikê mîna kerkê-kerajo û dom-dom-derxan, difistin, destên hev girtibûn û govenda xwe, şahiya xwe didomandin. Çiya dikirin mîna bihuştê. Mebesta gundiyan hemûyan bixêrhatina roja nû û bihara rengîn û ramaneke azad bû. Li ber bîlûra şivanan cotkarên gundiyan jî, dev ji cotên xwe berdabûn.

Navê gavan Hekîm; yê şivan jî Loq-

man bû. Apekî wan jî bi navê Apê Gel hebû ji mêj de ji gundê xwe derketibû ji bo ku dîroka çiya û newalên xwe binivîse, li nav welatê cîran dixwend.

Loqman bang dikir: "Hekîmo qurban şûsa dila şikestiyê cebar nabe"

Hekîmo dibêje: "Erê bira tu Loqman î, melhema birinan î, wekî pela gulan î, tu xortekî pîr hêja yî, tu sembola ciwana mamosteyê Loqmanî yî"

Piştî van gotinên hanê, Hekîmê reben piştî xwe daye tahtekî gîjo-mîjo difikire û diponije.

Refên kevokan firibûn ser hêlinên

dê, hin vedirîşyan, hin jî bi ronahiya xwe, rê nişanî gundiyan dida, da ku Hekîmê birîndar bibînin.

Piştî ku gundiyan birîndarên xwe dîtin û anîne mal, şeva tarî bi ronahiya hîvê ronî bûbû, bêdengiyek kûr û dûr ketibû nava gund. Qîzapa wî li ber serê wî rûniştiye û dibêje: "Rabe Hekîmê dilan rabe, mirina erzan ji me re nabe" û bi hişyariyê re stranên xwe berdewam dike.

Qîzapa Hekîmê reben ku navê wê Sebrê bû dilorîne li ser xwediyê birîna xedar û dibêje:

Dibên piştî çend salan apê Hekîmo dixwîne û li dîroka xwe digere; ji wî bajarî diçe bajarê din, rastiya dîroka xwe di sebra jiyana xwe de dibîne. Ew bi xwe bûye kalekî heftê û çar salî kes jê re nabêje kalê rihspî, êdî dibên Apê gel.

Piştî çend salên din, ji bajarê Stenbolê tevî du ciwanên bê guneh berê xwe dide paytexta welatê xwe, ji bo pîrozkirina roja nû.

Lê haya wî jê tune bû ku mozên sor di dûv de ne û wê li paytexta welatê wî pê vedin. Li paytaxteke din di navbera

Paşa û Mîrên Mozên Sor ên bi jahr, ku serokê wan M. Açar bû, biryarek hatibû girtin ku bi apê me yî rihspî û heftê salî vedin.

Qîzeke paşê hebû, Zeynaba zer (Çiller) jê re digotin; qîzeke gelekî sehrek û şatir şûmanî bû. Apê me yî ku navê wî Apê Mûsa bû gihîstibû navenda bajarê ku jê re digotin paytexta şêrin, Ameda kurdan.

Bi beyaniya sibê re ji xewna şîrîn rabû ser xwe. Piştî ku misk û mawer li xwe kir û baxê gulên xiste destê xwe, berê xwe da nava kolanan paytexta welatê zêrin.

Kevokên aştiyê bi ser bajêr de didan firandin.

Wekî dareke çinarê ku kevnar

bibe siya xwe bi ser kolanan de berda. Li hêla din celadên paşê û qîza paşê tevr û bivirên xwe siqa kiribûn ji bo ku wê dara kevnar di kokê re bibirin. Notirvanên celadan derdora bajêr kiribûn asêgeh ji xwe re.

Dema ew dara çinarê xistin erdê, tove jiyanêke bêdawî dijimîna bi destê xwe reşandin. Li şûna qurmê darê jî, gulên rengîn mîna qozeqerê vebûn û li welêt belav bûn. Ew gulên rengîn bûn hêviya gel û welatê xwe, heta serxwebûn û azadiya kurd û Kurdistanê.

Î. CAN DILBIRIN



"Sebrê, dotmamê ezê helbestek K. Bedirxanê nemir ji te re bixwînim."

Bêje, bêje strana welat ji min re bibêje" Dest pê dike û ji dil dixwîne.

Biharê, xweş biharê! gulên te çiqas rengîn in

Kesk sor û hêşin in, ev gulên te hemû bi bîn in

Me bi kêf û ken dikin, dilê me bi jiyane xweş dikin

Kurdistanê şên dikin, dibên dibistan pîr xweşik e

Bi hogir û hevala bi çîroka newala em hemî jê hez dikin.

(Ji bo zanîn kanî ye, tê de kenîn û listokê dibistan xweş xanî ye.)

xwe, hêdî hêdî roj dixeyirî û şûna xwe ji şeveke tarî û şilî re dihişt. Dengê bilind ji serê neqeban seranserî gund ve bilind dibû, bi dilekî şewat digot: "Pepû pepû! kê kuşt? Me kuşt!" dengê pepûkên reben li ser kerengvaniyê gund xurtir dibû. Kesî nedizanî çî qewimiye li serê çiyayên biguneh. Çiqas teyrik û tûrik hene tev li ser Hekîmê gavan helbest û stranên xwe yên evîni û bê kesayeti dixwendin. Çiqas dibû deng bêhtirîn nêzik dihat, hawar hawara Hekîmê bê guneh birîndar e.

Êdî şev bi nivî bûbû, hêj birîna Hekîmo nehatibû dermankirin.

Sitêrên li ezmanan xwe berdidan er-



# Hejmara 2'yemîn a Vate derket

Di vê hejmara kovara Vate ya ku ji hêla çend rewşenbîrên kurd ên kirmanckîaxêf ve li Ewropayê tê weşandin de, gelek nivîsên cihê-reng cih digirin. Kovar piştî pêşgotineke kurt, bi nivîsa li ser kombûna dawîn a rewşenbîrên navborî dest pê dike. Di vê civîna sêyemîn de li ser navên dewletan, îzafê û raweya xwedîtîyê biryar hatine girtin. Piştî vê nivîsê, nivîseke Mûnzûr Çem a li ser Serhildana Dêrsimê, bi navê "Ez ver va disemî çok ranênan" tê. Di vê nivîsê de li ser dîroka Dêrsimê û rewşa siyasî ya wê demê agahî hatine dayîn. Dûv re jî çîro-keke gelêrî bi navê "Pîr û Pişînge" ku ji aliyê Mihani Licokic ve hatiye berhevkerin, di nava rûpelên kovarê de cih digire.

Di vê hejmara kovarê de, her çiqas giranî li ser nivîsên dîrokî be jî, di gelek warên din de jî nivîs hene. Bi taybetî hevpeyvîna ku Seyidhan Kurij bi hunermenda kurd Nîlifer Akbal re kiriye, vê hevpeyvîyê hinekî diguherîne. Di vê hevpeyvînê de Nîlifer Akbal li ser huner û çanda kurdî bîr û ramanên xwe debire. Kesê ku dixwaze vê hunermendê jî nêzik ve nas bike, divê vê hevpeyvînê bixwîne.

Her wekî me berê jî dabû xu-yakirin, berevajî hejmara yekemîn di vê hejmarê de giranî li ser mijarên dîrokî ye, piştî vê mijarê, piraniya nivîsên mayî li ser zimên û girîngiya zimên in. Bo nimûne nivîsa Memed Drewş a bi



navê "Na ray raya yeweya ziwanî ya" nivîseke bi vî rengî ye. Hevpeyvînên bi kesên kal û pîr re di vê hejmara kovarê de jî didomin. Kazim Temurleng di vê hejmara Vate de bi Meleka Memedê Xidê Rey re, hevpeyvînek pêk aniyê. Ew jî serpehatiya xwe ya Terteleya Dêrsimê vedibêje.

Nivîsa Mehmed Uzun a bi navê "Dinya baxçe û her zûn û kultur yew çiçek a" her wekî ji navê wê jî tê fêhmkerin li ser çand û zimên e, lê ew bi mînakeke balkêş li ser vê mijarê radiweste. Lerzan Jandîl, rêzenivîsek bi navê "Sedserra 19'ine de halê împaratoriya osmaniyan û vurîyenê nê demî" amade kiriye, di vê hejmarê de beşeke vê nivîsê hatiye weşandin. Rêzenivîsek jî ji aliyê J. Îhsan Espar ve hatiye amade kirin, navê wê nivîsê "Beyi se bena?" ye û di şeweya çîrok û serborîyan de ye. Di vê hejmarê de ferhengoka ku ji aliyê Malmisaniy ve hatiye pêşkêşkirin balkêş e. Her wekî din, kesên mîna Memo Darrêz, Huseyin Kizilarslan, Ali Heyder Sever, A. Muttalıp Koç bi berhemên xwe bûne mêvanê vê hejmara kovara Vate.

Li gorî hejmara yekemîn, hin guherîn di vê hejmara Vate de balê dikişînin. Bo nimûne, di vê hejmarê de nameyên xwendevanan cih digirin. Li aliyê din li gorî hejmara pêşîn, zimanê nivîskaran zêdetir nêzik hev xuya dike. Kesên ku dixwazin vê kovarê bi dest bixin, dikarin serî li rojnameya Azadiya Welat bidin.

SERWISA ÇANDÊ

## Salnameya NÇM'ê ya 98'an


Navenda Çanda Mezopotamya digel hemû pest û kotekiyên hêzên dewletê kar û xebatên xwe yên çandî, hunerî didomîne û berheman dide. NÇM'ê ji bo sala 1998'an Salnameyek amade kirine. Amadekarên salnameyê di pêşgotinê de dadixuyînin ku; di amadekirina salnameyê de, mijarên li gorî hewcedariyên gel neqandine. Û mebesta herî girîng jî, ji bo ku gel rûpelek be jî, bi zimanê xwe bixwinin û bi vî rengî bala gel bikşîne ser zimanê wan.

Salname ji her alî ve tîr tîjî ye. Agahiyên ansiklopedîk, gotinên pêşiyar, gotinên kesên navdar, di dîrokê de bûyerên girîng, tiştonek, pêkenî, agahî, nasandî, çîrok, helbest, ferhengok, portre û hwd. cih digirin. Di salnameya îsal de, bi piranî portreyan cih girtine. Hunermend û nivîskarên bi nav û deng û şehîdên ku di dîroka Kurdistanê de bûne sembolar, mijara wan portreyan in. Di salnameyê de tiştêkî balkêş jî cihdayîna helbestan e. Ji bilî helbestên xebatkarên NÇM'ê helbestvanên cihêreng jî bi helbestên bijarte di rûpelên salnameyê de cih digirin.

Di Salnameyê de ji bilî zaravayên kurmançî, cih dane nivîsên dimilkî jî. Rûpelên salnameyê her yekşemî bi tevahî bi zaravayê dimilkî hatine amadekirin.

Yek ji balkêşiyên salnameyê jî nexşandina rûpelan e. Rûpelên salnameyê li gorî wateya mehan, bi wêneyên kesayetiyan girîng wekî; Mazlum Doğan, Ehmedê Xanî, Mihemed Qazî û hwd. hatiye nexşandin.

SERWISA ÇANDÊ



## Bersiva zikreşiya dijmin berhemên baş in

MEDENÎ FERHO



Tirk ji eraban hez nakin. Dijminê gelê ereb in. Ereben 'qawmê' duyemîn yê îslamê dibînin. Divê ku qewmê yekemîn tirk bin û baweriya wan jî ev e. Ev dîtîna û bawerî ya "Aydınlar Ocağı" ye. Û teza ku tê pejirandin: "Ne sosyalizm, ne kapitalizm... Navekî din ji hûnandin û lidarxistina nûjen ya Tirkîyeyê pêwîst e. Û lêgerîna vê sistemê jî di nav dîroka xwe de pêk tînin ku wan bi destên xwe afirandine..."

Dema hêzên îslamê ketin Kurdistanê û Persê, li hemberî dewlemendî û çanda tîr-xemilî û tîr-nigar şaş bûn. Dema xezîne û dewlemendiya Îranê giha paytexta împaratoriya erebî, ku bi navê îslamê hate avakirin; cenabê Emer giriya û got: "Îslam wê jî hundir ve pûç bibe."

Tirk hez ji kurdan nakin. Mînakek jî kongreya 'Aydınlar Ocağı' ye ku di 27'ê gulana 1988'an de pêk hatiye. Axafînên di vê kon-

greyê de vê rewşê xweş nîşan didin:

**Faruk Sümer:** Herêma Derya Reş tu talûkê dernaxe hemberî me. Zimanê tirkî û toreyên tirkan serdest in, 15-20 hezar kes gurcî mane. Talûkeya girîng kurd in.

**Omer Faruk Akun:** Perwerdehî û eskeriya Cimhuriyê, pêwîst bû ku ev kes bihelandana. Di sedsala 19'an de bi Osmanî û Îslamê re hatibûn girêdan (.....) Mem û Zîn di şewaza mesnewiyê de çîrokek tirkî û kurdî ye.

(...)

**Omer Faruk Akun:** Di Journal Asiatique de gotina kurdologie hate firehkirin. Mukrî, nişekî îranî ye.

**Recep Doksat:** Gelo kurd nîn in? Îran, Amerîka, Îsrail û Rûsya vî agirî geş dikin. Em yek qederê dijîn. Pêdiviya xwendina raporên misyoneran heye.

**Ercument Kuran:** Wêjeya wan nîn e, zimanê wan heye. Derdorên bajarên dagirtine, di waroşan de dijîn.

**Ahmet Kabaklı:** Em ne nijadperest in, lê li Tirkîyeyê nijadperestiya gelên hindik heye.

**Faruk Sumer:** 'Qewmê' tirk heye û îranî ye. Şah, ev bi kar anî. Çand bingeha neteweyîtiyê ye.

(...)

**Mehmet Eroz:** Zaza, Kurmançî, Qerehanî ji hevûdin fam nakin. 'Dede' hêza xwe winda kirine. Kî li wan xwedî derbikeve ye wan in.

(...)

- Neteweyetî sedemeke hişmendî ye...

- Birêziya hunermendan....

- Wergera berhemên misyoneran....

- Seyahatname û berhemên cografîk yê seyrah...

- Pêdiviya zindîbûna pirtûkxaneyan ji hêla zanîngehan ve...

- (...) Kovar....

- Kongreyên zimên...

- Dîrok zanistî ye, ne hişmendî ye....

- Pêdivî bi şîrovekaran nîn e.

Bersiva van biryarên nijadperestî ku li ser armanca helandin û ji holê rakirina gelê kurd hatiye lidarxistin, divê ne ambargoya li ser pirtûk û kovarên kurdî be. Bersiva wê divê afirandina berhemên bi kurdî be. Kurd divê bi berhemên cur bi cur ên çand û hunerî bersiva ve yekê bidin. Îro ev bersiv bi pirtûkên wekî roman, çîrok û helbestan û bi kovar û rojnameyan tê dayîn.

Bi vî awayî jî wê zikreşiya dijmin bibê sedema peqîna wan, lê divê kurd dev ji zikreşiya li dijî hev û berhemên hev berdin.



# Dengê sazê

**B**erê ku dibû şev, derî dihatin dadan û şûrik didane paş. Şûrik ji dar çêkiribû, wê gavê mifte û kiltîten hesinî tunebûn. Rojêkê yekî gundî li mala xwe radikeve û şûrika deriyê xwe dadide. Yekî diz tê ku têkeve mala wî. Bala xwe didê ku derî zexm e û şûrik dadayî ye. Ê diz bi birekê şûrika derî dibire. Bi dengê birekê xwediyê malê pê dihesse. Tê ber derî û ji yê diz re dibêje:

- Tu kî yî û tu li ber deriyê min çi dikî?

Ê diz navekî xelet dibêje û dibêje:

- Ez li saz dixim.

Xwediyê malê dipirse:

- Ka dengê ji saza te nayê!...

Ê diz dibêje:

- Belê, anika deng ji saza min nayê. Lê belê ewê sibe deng ji saza min bê.

Xwediyê malê dibêje qey bi rastî yekî xerîb e, ji xwe re li saz dixê, dîsa radikeve. Ê diz jî deriyê wî vedike, dikeve mala wî. Heta ku dikare firaqê wî dibe. Sibê mêrik radibe bala xwe didê ku mala wî vebûye û dizan gelek alawên wî birine. Ji gundiyan re dibêje:

- Diz ketiye mala min. Gundî jê sewal dikin.
- Tu çawa bi xwe nehesyayî? Ma çawa te kesek nedîtiye?
- Xwediyê malê ji gundiyan re dibêje:
- Welleh min nedît kesek kete mala min, lê belê min dît yekî li ber deriyê min li saz dixist.

Gundî jê dipirsin:

- Saza çi?

Xwediyê malê dibêje:

- Welleh bi şev di xew de ez bi xwe hesiyam, min guhdarî kir dengê xirtexirtê hate min. Min bang kir: 'Tu kî yî?' Yekî jî li min veherand got: 'Ez li saz dixim.' Min jê sewal kir: 'Kanî deng ji sazê te nayê?', 'Wî jî ji min re got: 'Wê sibê deng ji sazê min bê.' Gundî ji xwediyê malê re dibêjin:

- Rast e, Va ye deng ji saza mêrik hat.

Xwediyê malê dîsa jî fêhm nake.

Gundî dibêjin:

- Hey bêaqilo!.. Wa ye mala te vekiriye û tiştên te dizîne. Ew e dengê saza wî.

SEYDO BAŞÇI

## Ey Hurî...

Zek şima zî zanê, şaro verin dewa xo ra, şaristanê xo ra vîşêr dîna ra çî nêzaneynê. Hela mêrdimî dewijî, jiyane şaristan ra bêxeber bî, hewey ewro nêbî.

Dewa qelbîn ra yew mêrdek nêweş kewno. (Qelbîn dewa qezay Pîran a) nêweşaneya ey xedar bena, ey bişonê Pîran, Pîran ra benê Diyarbekir, nêweşxane de kuştî finenê.

Mêrdek tê xo yeno, çiwane xo akeno kî yewna ca do, ewnîno dormeraye ey di ceneşkî cilê spî piradayey vindertey, vano qey ez merdo şiyî a dîna binî, enê ceneşkî zî hurî vano: "Ey hurî ben bedrî."

## Malesef

Pîran ra yew xort şono eskerey. Çend meng ra dima ma û pî xo rê yew mektûb erşaweno.

Eyla/labêlê o wext keso ke tirkî bizano, nivîs biwano peyda nêbiyî, yewer vînenê mektûb danê ey vanê: "Eno mektûbê lajê ma, ma rê erşawita ti şene biwane", serey mektûbê de lajek ma û pî xo rê mêrdiman dê xo rê silamî nûşte, yew cayê mektûbê di:

"Malesef hetan nika mi nêşîna şima rê mektûb binûsa, quserê mi mewnê."

Goşdaran ra yewer vano:

"Eno malesef çiyî?" Wendox vano:

"Lajek nêşînawo yew bi yew nameyan reydi şima rê silam binûso, vato ma-

lesef yanî ez mehla seftar ra seraver silam kena."

## Xêrnexwazey

Mêrdim heme kes ra ver, çiyî weş xo rê wazeno, qayîlo ke heme çiyî rind xo rê bigiro. La belê ek ey rê yew zirar resa, wazeno ke, her kes aynî zirar veyno. Xêrnexwazey şarê ma miyan de hîna zaf a.

Pîran ra yew mêrdim wayirî duşman beno, dano piro, şono Diyarbekir. Dewa xo rê duri kewtin ey rê zaf zor yeno, seba ena wazeno ke dewijî rehetey nêvinê yewnan reydi bidê pêro.

Çiqas ke dolmişa dew yena berê koy şinasayanê xo ra perseno dewî di çî esto? Çi çino? Tim tim zî cewabanê weşey esta, rindey esta" Eşnaweno, bado çend ser ra pey vano: "Tesliya mi kewta, piranjî yewnan nêkişenê."

## Rada hewt deyran

Wexto verin de televizyon çinêbî. Radî tena estî bî, şar radî reydi acasî û deyri goşdaristinê. Radî heme ca de zî çinêbî, qehwan de, yan zî, kê mêrdimê pîlan de estîbî.

Qelbîn ra yewer, xo rê yew radî erfeno û dewijan ra vano: "Mî xo rê yew radî girota, hindî hewla, hind hewla ke hewt hebî deyran pê sero vana."

SERDAR BEDIRXAN

# BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (101) XAÇEPIRSA

Şehidek (wêne)	Bi erebî piraniya kurd	Herîr, Hevrîşim Dengdêrê n 'Rona'	Dawera Kukürtê Tîpeke dengdêr	Bi glştî	Demsalek
Sewalek	Aj			Alaveke çandinîyê	
Ziyan				Heyv Bi reqemê romayê pêncî	
Vekite				Diravê Bulgarîstana Tîpek	
		Rojek		Nêçîr, seyde Bêşik, Landîk	5
		Pêşgirek			
Dawera İyotê	Dîlşa (berepaşkî) Emirtî		Tîpek		Cinavkek
Kat			Dawera Karbonê		Dawera Florê
		Cirfîn, Lerizîn Tîpeke dengdar			
Rîh, rû					
Qirn, sedsal		Kurtebêja Mitroyê	Dawera Azotê		
		Parkîtek	Kor		
		Dawera Argonê Berepaşkî 'Tûj'	Dawera Kalsiyumê (Berepaşkî) Tîpek		
Xudmuxtarî, xweserî Medot					
			Dawera Lantanê (Berepaşkî)		

**Bersiva Xaçepirsa 99'an**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 101'ê Salnameya 1998'an a NÇM'ê ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

**SALNAMEYA ROJÊ YA BI DEMJIMÊR 1998**

Navenda Çanda Mezopotamî

Pênc kesên ku xelata hejmara 99'an Salnameya NÇM'ê ya 1998'an qezenç kirine: **Berfîn Baran/Çewlik, Barış Güven/Hatay, Mirza Oğuz/Sêrt, Fettah Tekirdağ/Isparta, Metin Kaya/Ştenbol**

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6





## Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan: Hereketê gerîlayo Tirkîyeyî bo

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî qandê sera newî ebi raya MED-TV'ya sera newiya şarê kurd û şaranê bînan pîroz kerd, hedreyin û pawitinê xo yê sera newî ardî zîwan û vat: "Ek dewleta tirk 1998'de jî şerê lîminî (qilêrinî) de îsrar bikro tirkîtiya Anatoliye qediyena".

Serokê giştîyê PKK Abdullah Öcalan 28'ê menga berfanbar de raya telifoniya bi tewrê Panelê MED-TV. Serokê PKK Öcalanî şero lîminî (qilêrin) ke Kurdistan de rameno ey sero jî qisey kerd û wina vat: "Mayê wazemi sera newî bibo, sera aşî û diyalogî. Çimke bê raya diyalogî no şer çareser nêbeno û xora zewbî ray jî çinya". Seroke PKK qiseyê xo wina ramitî: "Ek sera newî de qandê şerî qediyayin û diyalogî gama newî çebyo, ma dê jî qandê çareserîna qesasanê (meselanê) Tirkîye bixeftiyim û rol bigim".

### Mayê bandorê şovenîzm bîşkinim

Goreyê vatena serokê PKK, sera newî de hereketê gerîlayo bibo tirkîyeyî û qiseyê ke derhaqê PKK de vajenê iyê jî werte ra hewadiyê. Nê qisey ke werte ra hewadiyê miyaneyê şovenîzmî şikyeno û verê mûxalîfanê Tirkîye abyeno.

Serokê PKK Abdullah Öcalanî da zanayin ke serdarên dewleta tirkê her roj vejyênê û vanê: 'Ma PKK qedîna, ma PKK kerd marjinal', nê vatenen ser Öcalanî vat: "Nê pêro zûrî yê. Ma emser par ra zaf bîm gird û ma gerîla Kurdistan ra kirîşt koyanê Karadeniz û Torosan ser û mayê her roj, ver bi miyanê Tirkîye şim."

Serokê PKK polîtikayanê artêşa tirk sero jî vindart û wina vat: "Artêşa tirk û heve-



yê partiyanê tirkan miyan de heveyê serdar û sermayanê wazenê no şer biqediyoy. La belê jew wasten ra şer nêqediyeno. Ek niyê wazenê nê şerî biqedînê û qandê Tirkîye teva bîkrê, gerek nê însiyatîfê xo vêşî kirê. Nînan ke wina kerd no şer wextêdo zaf kilmî miyan de qediyeno. Xora wina mekrê no şer nêqediyeno û 15 serî dîha keno winî û o çax çareserîna ewroy ra beno zor. Coka ezo vana êkê nasnameya kurdan silasnenê wa programêdo newe vejê xo ver û wa goreyê nê programî bixeftiyê."

### Polîtikayê teverî qediyê

Öcalanî polîtikayanê teverî ser jî vînanî nê xo wina ardî zîwan: "Almanya û Tirkîye qesasa kurdan de, ebi taybetî jî PKK sero polîtikayanê hetbaran de (ortak politikada anlaşmışlar) ameyê werê û armancê nê werê-ameyin jî reformîstanê kurdana ronîştino û PKK jî qedînayin o. Ma bi xo nê poli-

tikay verî dî, la belê nê dewletan nê polîtikayê xo miyanîkî tepîştî û iyê wazenê hewna jî miyanîkî tepîştî. Çimki hewna pawitinê Almanya nêqediyay. Ek wina mebo, Helmut Kohl hendayê Tirkîye sero vindeno? Kes vano qayê Helmut Kohl serokwezîrê Almanya niyo, serokwezîrê Tirkîye wo." Serokê PKK pîrsa, "Ek tewawo winaynîn esto, çira mabenê Almanya û Tirkîye xerpiya wo," ser jî vat: "Rast o ewro mabenê Almanya û Tirkîye heveyê xerpiyawo, sebebê ci zek şima jî zanê Tirkîye wa, roj ra roj bena teşarona Amerika û Îsrail. Goreyê min Almanya wa nêwazena Tirkîye teşarona Amerika û Îsrail bo. Çimki Almanya wa wazena Tirkîye teşarona ci bo. Coka ewro mabenê nînan heveyê xerpiyawo, oyo winî ayseno ke, mabenê dewleta tirkî, dewletanê bînan roj ra roj xerpiyeno û polîtikaya ci na teveriya qediyena."

MABENDÊ VENGÛVAZAN

WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX:  
(0 212) 251 90 13

Gerîndendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê tēkiliyên bi gel re  
(Halkla ilişkiler müdürü)  
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:  
(Nünerê Giştî yê  
Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15  
Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helîm Yûsiv  
Berlin:  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49 572 18 13 60  
Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43



# Ji Gündem 'ê

Dewleta tirk dît ku bi qedexekirin û desteserkirinê nikare rê li ber geşbûna çapemeniya kurd bigire, biryareke nû girt û li nav sînorên Kurdistanê belavkirin û xwendina Ûlkede Gündemê qedexe kir. Vê qedexeya ku pêşî bi awayekî ne-qanûnî dest pê kiribû, di 1'ê berfanbara 1997'an de bi biryareke fermî ji bo şermezarkirina vê biryarê emê ji vê hefteyê pê ve vê rûpelê ji bo manşetên Ûlkede Gündemê terxan bikin. Heta ev qedexe bidome, emê ji vê helwesta xwe bidomînin.

28 berfanbar 1997'yan:

## SÎSTEMA GIRTÎGEHAN MIROVAN DIKUJE

Osman Daş ê ku di bin çav de ji ber îşkenceyên giran aliyekî bedena wî felc bûbû, piştî razana 3 mehan li qawîşa mehkûman a "Nexweşxaneyê Nimuneya Enqerêyê" li heman cihê roja 27'ê berfanbara 1997'an di 43 saliya xwe de şehîd ket. Osman Daş di rêbendana 1995'an de li Edeneyê hatibû girtin û

piştî gelek îşkenceyên xedar ji 'endame-tiya PKK'ê 12 sal û 6 meh ceza xwaribû û ew şandibûn Girtîgeha Konyayê, ji wir jî biribûn Girtîgeha Bartın ê. Parêzerên Osman Daş, M. Nuri Özmen û Bedîa Buran daxuyandin ku muwekilê wan ev sê meh in ku li nexweşxaneyê di qawîşa mehkûman de ye, lê tu tişt ji bo tedawiya wî nehatiye kirin. IHD û TAYD-DER'ê ji vê mirinê rayederên dewletê berpîrs girtin û ew tawanbarkirin.

29 berfanbar 1997'yan:

## HIŞYAR AĞAOĞLUYÊ HADEP'Î HATE KUŞTIN

Hişyar Ağaogloyê ku li Dara Hênê (Genc) ya Çewlikê amadekariyên sazîkirina HADEP'ê bi rê ve dibir, roja 27'ê berfanbarê ji aliyê kesekî bi navê Ayhan Yılmaz ve hate kuştin. Li gorî çavkaniyên herêmî kûjer Ayhan Yılmaz herdem alkolik e, eroînê dikişîne û bi timên taybet re digere. Birayê Hişyar Ağaogloyê Nihat Ağaogloyê, ev qewimîn we-

kî bûyereke siyasî bi lêv kir û da zanîn ku birayê wî gelek caran hatiye binçavkirin û bi mirinê hatiye tehdîtkirin. Nihat Ağaogloyê wiha got: "Qatil hatiye bikaranîn, lê li pişt vê bûyerê hêzên tarî hene. Hişyar Ağaogloyê bi beşdarbûna çar hezar kesî li Dara Hênê hate binaxkirin.

30 berfanbar 1997'yan:

## MESAJA SEROKÊ GIŞTÎ YÊ PKK'Ê

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji bo sersala nû mesajek ji gelê kurd û tirk re pêşkêş kir. Öcalan di mesaja xwe de bi giştî li ser van xalan rawestiya: "Gelên Tirkiyeyê ji di nav de, ez sala nû ya tevahiya gelên Mezopotamya û Anatoliyayê pîroz dikim. Divê şer di 1998'an de bi çareseriyê siyasî biqede. Mûxalefeta Demokratîk a gel pêk hatiyê, nivê Tirkiyeyê li benda politikayê nû ye, lê daxwaza plan û tifaqan nayê dîtin." Her wiha Öcalan got ku dagirkirina başûrê Kurdistanê dewleta tirk xistiye nav bêçaretîyê mezî. Di mesaja xwe de Öcalan bal kişand ser tê-

kilî û peywendiyên Tirkiye û Almanyayê û wiha got: "Tirkiye xwe nêzîkî Îsraîl û Amerikayê dike û rasterast ji wan re dibe wekî taşeron, lewre ji Almanyayê hevalbendekî bi vî rengî naxwaze, ev yek ji dibe sedema têkçûna tirkîliyan tirk û almanan.

31 berfanbar 1997'yan:

## LI DIJÎ ARIZÎKIRINAN REAKSIYONÊN TÛJ

Ji bo ku hikûmet ji IMF'yê pere û krêdî pêda bike, roj bi roj lezê dide arizîkirinê û di vî warî de hevdiîtinên xwe bênavber didomîne. Piştî arizîkirina santaralên termîk, Fabriqeya Titûnê ya Akhisarê, hate ragihandin ku fabriqeya kaxedan ya SEKA ya Balikesirê ji daxilê vê yekê bûye. Wekî tê zanîn, 680 kedkarên Santrala Termîk a Yatağanê roja 19'ê berfanbarê li hemberî vê kirinê ketibûn greva birçibûnê. Lewre ji ji bo ku bibin piştgir "Platforma Şaxên Sendiqeyên Karkerên Stenbolê" ku ji 5 hezar kesî pêk dihatin roja 30'ê berfanbarê 2 satetan dev ji kar berdan.

# Ji Edîtorê Gündemê

Dewleta tirk bi tîkçûn û aloziyên ekonomîk û siyasî, gelê kurd û tirk jî bi serkeftin, êş û dilşadiyan sala 1997'an li pey xwe hişt. Di hefteya yekemîn ya sala 1998'an de, ji ber ku Rojnameya Azadiya Welat rûpelekî xwe ji bo me vedîqetîne, di destpêkê de em spasiyên xwe pêşkêşî wan dikin.

Di sala 1997'an de, wekî salên raborî gelê kurd şerekî dijwar ji bo azadiyê, gelê tirk jî tîkoşîna çinayetiye domand. Ji ber ku em parçeyek ji vê tevgerê ne, me xwest wekî çapemeniyê barê li ser milê me bi layiqî hilgirin û peywirên xwe bi cih binin. Dîsa me xwest ku em bibin dengê daxwaz, axîn û hêrsa gelan. Ji ber kêmbûna derfetan, di bicihanîna vî karî de em gelek tengijîn, lê bi nûçeyên manşetan û bi mijarên balkêş û bi teşhîrkirina şerê qirêj me çeper hem li sîstema faşîst û dewleta nehênî û hem jî li çapemeniya birjuwa teng kir. Ji ber van sedeman em bi her cureyî qedexebûn, rêlibergirtin û metodên çewşîner re rû bi rû man.

Rojnameya me Ûlkede Gündem di 7'ê tîrmeha 1997'an de dest bi weşanê kir û heta îro bi domdarî 178 hejmar (li gorî 01.01.1998) hatine weşandin. Der heqê 150 hejmarên me de ji hêla serdozgeriya DGM'ya Stenbolê ve ji ber xala



3713'yan a zagona bîngêhîn doz hatine vekirin. Ji 26'ê kewçêra 97'an ve nahêlîn ku rojnameya me li herêma awarte û bajarên derdora wê, belav bibe û dest datînin serî.

Ev astengkirin, rêlibergirtin û desteserkirinên keyfî ji 1'ê berfanbara 97'an û vir de kete resmîyê û rojname li gorî xala 11/e ya zagona OHAL'ê li Kur-

distanê hate qedexekirin. Bûroyên rojnameyên me bi dehan car hatin dagirkirin, nûçegihan, belavkar û xebatkarên me hatin binçavkirin û bi mirinê hatin tehdîtkirin. Bi hinceta nûçeyan û nivîsên ku di rojnameyê de hatine weşandin derbarê berpîrsê karê nivîsaran û nivîskarên me de bi dehan doz hatine vekirin.

DGM ya 2. ya Stenbolê ji ber nivîsa

nivîskarê me Hatip Dicle ya bi sernavê "Dêrsim Dramî" û ji ber daxuyaniyên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan der heqê rojnameya me de roja 25'ê berfanbara 1997'an, 20 roj cêzayê girtinê da rojnameya me.

Lê dîsa ji li hemberî van yekan bi piştigirî hêz û moralaya ku gelê kurd û tirk di-de me; me riya xwe kudand. Bi kongreya kurd, bi germbûna herêma Karadenîzê, bi dînamîzma başûrê Kurdistanê, di rih, fikir û kesayetiye de bi teqîneke civakî û siyasî em bûne dengê gelê kurd û dengê kedkarên tirk.

Em dê vê nasnameyê di sala 1998'an de jî bilind bikin. Hêza sefil û diyar li

ser me zor û zilmê bi kar tîne; ne pêwîst e ku em zagonên wan, kontrayên wan, timên wan, polîsên wan û mafyaya wan binin zimên. Jixwe di sala 1997'an de em bûn şahidê weşet, kiryarên dij-mîrovî û rezaleta daxwaza wan. Di 98'an de jî em dê şahidiya dîroka rastîn bikin. Em hêvî dikin ku sala nû ji gelên bindest re aşî azadî û biratiyê bîne.